

Niha mûxatab li ber çavan e.


Ku te ev mûxatab nepejirand, behskirina aştiyê bi kêrî tu tişfî nayê.

Gotinên beredayî ne û xwe xapandin e. Divê em vê yekê bi awayekî vekirî bînin zimên.

Tevgera îro di nav tevgera şoreşger a cîhanê de cihekî girîng digire. Vê tevgerê, wekî rêber jî ji xwe re îdeolojiya nûjen a serdemê me hilbijartîye. Divê em vê cudahiyê bibînin. Di nav tevgerên kurd de cara yekemîn ez di nav PKK'ê de li internasyonlîzmê rast hatim.

Niha ez li ser maseyê rûnim û bibêjim: "PKK ev kir, divê wisa bikira", ev tiştekî ecêb e. PKK li ser maseyê nayê rexnekirin. Her kes xelefî û çewtiyan dike.

Rûpel 8-9



Nûçe:

Gelê Başûr dagirker
protesto kir

Rûpel 3

Bi çavên Moltke:

Romkela, Bêrecûk,
Riha


Rûpel 4-5

Zülküf Kışanak

Roşniya çimê ma
Adnan Işık

Rûpel 6

Azadiya WELAT



SAMI TAN

Her wekî rojnamegerekî ku beşdarî ger lêşkeran bûbû, ew şer, bi tenê şerê du hêzên çekdar nîn e, şerê du bîrdozan, du pergalên civakî û berî her tişî du kesayetiyên e

Di her warî de berberî

Heftaya çûyî wekî dûmahika gera rojnamegeran a li Kurdistanê "Siyaset Meydanî" ya ATV'ê li Şimexê pêk hat. Li gorî agahiyan ku berî bernamêyê hatibûn dayîn, diviyabû bernamê li ser rewşa perwerdehiyê û pirsgrêkên wê bûya. Lê ji ber ku kesên neqandî beşdarî bernamêyê bûn, tu pirsgrêk nehatin zimên, "Siyaset Meydanî" bû qada bergerîn û lavakirînê.

Di vê bernamêyê de şexsiyeta kurdên ku dewleta tirk dixwaze biafirîne û nêzik-têdayîna kemalîstan a li hemberî kurdan gelek zelal derdiket holê. Dewleta tirk tim dixwaze li pêşberî xwe kurdên lavaker û reben bibîne. Divê tim kurd bigirin, hêstiran bibarînin, lê bi tu awayî serhildêr nebin. Dema lavaker bin dibe ku "tirkên ronak" li "rojhilatiyên lipaşmayî" bîn rehmê, bermahiyên xwe bidin wan, ji bo ku ew hînî tirkî bibin alikariya wan bikin. Wekî nimûneya rebeniya kurdan, zarokê ku bi tirkî nîzane ji li stûdyoyê dabûn rûniştandin, di çav wan de ew zarok bê zar û ziman bû, heta ku hînî tirkî nebe mafê axaftinê bi dest naxe.

Wekî çare ji fêrgehên (dibistan) berî dibistanên seretayî dihatin pêşniyazkirin.

Li gorî bîrdoza fermî kurd nezan in, reben, xizan in, pêdiviya wan bi asîmîlasyonê heye, haya wan ji nîrxên neteweyî û mirovî nîn e, ketine derdê nanê xwe, dema zikê wan tîr bibe, baş bîn "timarkirin" li rastê kurdîyê namîne.

Bi rastî kesên ku beşdarî bernamêyê bûbûn ji peywira xwe baş bi cih dianîn, digirin û digotin: "Çima mamoste nayên, em wan didin ser serê xwe, lê dîsa ji nayên, çima?" Ev kesayetiyên kurd dilê dagirkeran xweş dike.

Di şerê azadiyê de şoreş kesayetiyêke pir bilind afirand, mirov li hemberî zilmê xwe dikin teqemenî. Li hemberî vê yekê dijmîn ji kesayetiyêke diafirîne, kesayetiyên ku dijmîn dixwaze, me li jor rave kir. Dijmîn birek mirovên kurd bi darê zorê ji civak û hilberînê qut kirin, ji her alî ve bi xwe ve girêdan.

Mirovê bi vî şeweyî, dagirker dikare bixê her qalibî, li gorî dilê xwe pê bilîze.

Di vê yekê de rista nexweşiyên dîrokî û pergala paşverû ne hindik e, tîkiliyên

feodal mirovên kurd ji rastiya neteweyî û mirovahiyê dûr dixê, wan di destê şêx û axayan noker de dike qirdik, ji ber ku ew noker qirdikên destên dijmîn in, ew ji dibin pêlîstikên dijmîn.

Li aliyê din dagirker bi salan e ku civaka me li gorî bîr û ramanên xwe perwerde dike, bi mirovên me wekî libên tîzbiyê dilîze. Ew yek ji dibe hoyek ji bo derketina kesên ketî.

Di helwesta beşdarî bernamêyê de tiştekî din ji bal dikişand; wan dixwest navê serhildêriyê ji ser xwe rakin. Ji ber ku welat bûye qada çalakiyên gerîla û serhildanên gel. Dijmîn baweriya xwe bi tu mirovên kurd nayîne. Ji bo vê yekê ji wan kesan xwe dixistin bin lingê dijmîn.

Bi kurtasî her wekî rojnamegerekî ku beşdarî gera lêşkeran bûbû digot, ew şer, bi tenê şerê du hêzên çekdar nîn e, şerê du bîrdozan, du pergalên civakî û berî her tişî du kesayetiyên e. Lewre ji divê em li gorî vê yekê tevbigerin.

Gerîla dengê azadiya gelan e

Ferhengok

an na: nexwe (yoksa)
asêgeh: keleh, hîşar
avjenî: soberî, melevanî
avzêk: pengav, herz
bazingirin: dorpeçkirin
berzebûn: windabûn
bêdadî: bê edaletî
binecîh: kamp, baregeh
cudahi: ferqiyet
cudakar: cudaxwaz
cûlûberg: kinc, tîmêl
çak: baş, çê, qenc
çatêrê: kawsak
çepel: qirêj, qîlêr
çinayê: sinif
dadgeh: mehkeme
dargêh: cihê giregirî
debabe: tanq
darizandin: mehkemekirin
danîşgeh: cihê rûniştênê
delav: kûm (yalak)
desthilatî: iqtidar
dozin: ditin
digel: tevî, pê re
erdnîgarî: cografya
erdhejin: zelzele
fûrîn: bêhn û hîlmê jê hatin
gengaz: pêkan, mimkûn
gotar: meqale
handan: teşwîqkirin
hoy: merc, şert
hejar: xizan, şerpeze
helwest: tewr

hempîşe: meslektaş
hevalbend: muttefik
hevbeş: hevpar, nîvekar
heta hetayê: heya dawiyê
hewidan: danxwe, cehd-
kirin
hêstir: dewe
hêjatin: herî hêja
keştî: wapûr
kîtlîk: pisik
kujînde: kujîner
lêhûrbûn: konsatre bûn
mayînde: timî (kalıcı)
mîhrîcan: festîval, şahî
mîrabin: heyf, naxêr
nasnav: taybetiyên etnik
û şexsî
nivîsgeh: bûro
nevî: torî
pergal: sazûman, sistem
pêşwazî: pêrgînî
rêje: nisbet
rihakirin: rizgarkirin
sayî: zelal, ron
serdem: heyam, çax
seyd: nêçîr (av)
seyn: balkêş, ecêb
sotin: şewitandin
şopandin: taqîpkirin
şewaz: uslûp, stîl
têgîh: mefhûm (kavram)
tîka: rîca
xislet: taybetmendî
xweserî: cihêreng

MUZAFFER AZAK
RIYAD AHMED HESEN

Ji bo azadiya gelan, di roja me ya îro de rista şerê gerîla ji her demê bêtir pêwîst e û girîng e. Çawa ku hemû kevneperest, paşverû û dagirkeran tîkiliyên xwe xurt kirine, pêwîst e ku tîkiliyên gelan hîn zêdetir kûr û zêde bibin.

Erd û axa Anatoliyê di destpêka dîrokê de heyatî demeke pêş de, cih û warê ronahiya şaristaniyê bû. Bi her rengekî gel bi ser wê axê bi biratiyeke xurt tîkîlî danibûn û dijmîn. Bi derketina kemalîzmê re ev dewlemendiya pîrozbuha ji gelan re bû gor û dogeh.

Heta şerê Tevera Azadiyê tu hêzekê nikaribû serî li hemberî kemalîzmê rake. Ên ku serî rakirin jî, ji hêla kemalîzmê ve ji holê hatin rakirin.

Lê gerîlayên azadiyê hemû listik, dek û dolabên kemalîzmê tev derxistin holê. Ev yek ji dibe sedemê xwenaskirin û derxistina dengê azadiya gelan.

Ji bo vê yekê, divê ku rista gerîla li Deryaya Reş û li Deryaya Spî bi rengekî kûr were nîrxandin. Armanca gerîla li Derya Reş kûr û fireh e. Berî her tişî gerîla ji bo şoreşa Tirkîyeyê bîngeh e. Şerê taybetî heya niha eniya Tirkîyeyê ji xwe re kiribû eniya dawî, mebesta gerîla belavki-

rîna vê eniyê ye jî. Bager û bablîso-ka li Cûdî, Gabar û Botan îro bi sê milan ve li nava Anatoliyê tê meşandin. Çarenûsiya gelê kurd û tirk dibe yek.

Ev demeke dirêj e şerê taybetî bi hemû hêzên xwe yê lêşkerî û medyayî li ser Deryaya Reş disekine. Hemû endamên rêxistinên kontra li Deryaya Reş kom dike. Mebesta wan ev e ku rîya herêmê li pêşiya gerîla bide girtin. Ji bo vê yekê ye, ew

Ev rewş bêcarebûna şerê taybetî li hemberî gerîla dide xuyakirin. Dibe ku çalakiyên kontr-gerîla bide gurtirin û li hemû deverên Tirkîyeyê belav bike, lê ne gengaz e ku pêşiya tîkîlîna xwe bigire

hemû tatkîk û planên ku berê li Kurdistanê pêk dianîn, îro derbasî Tirkîyeyê dike.

Ev rewş bêcarebûna şerê taybetî li hemberî gerîla dide xuyakirin. Lê rastî ew e ku, çiqas bilebite jî nikare rê li ber gerîla bigire. Dibe ku çalakiyên kontr-gerîlayê bide kurtkirin û li hemû deverên Tirkîyeyê belav bike, lê careke din ne gengaz e ku pêşiya tîkîlîna xwe bigire. Heta niha bi şerê Kurdistanê telişên (çatlak) mezin di serwertiya dewleta tirk de hatin vekirin, wê ji vir şûn de jî, li çar hêlên Tirkîyeyê telişên mezin zêde

bibin. Bi tesîra şerê gerîla û bi serî rakirina gelên Anatoliyê bandora kemalîzmê wê li ser gelan nemîne.

Ji ber ku, her livbaziyeke gerîla qutkirina rehê kemalîzmê ye û geşbûna giyan û dilnê gelan e. Lewre ji lingên hemû rayedarên, komara tirk ketine soleke teng. Ew dixwazin bi propagandayên derewîn reaksiyona gelê Anatolî li hemberî gerîla bidin çekirin, lê ne gengaz e ku, ew di vî warî de bi ser bikevin.

Tevgera Azadiya ne tenê bûye tevgera neteweyî, her wiha tevgera gelê tirk, ermen, laz, rûm, gurcî, çerkes û tevgera hemû mirovên bindest û kedkaran e. Ev rastiya hanê tevgera azadiyê bi pratîka xwe da daye îspatkirin. Wekî şehîdê leheng û mezin Kemal Pîr digot: "Rizgarkirina gelê tirk, di rizgariya gelê kurd de ye."

Bi rastî jî, serokatîya li Kurdistanê, serokatîya hemû gelên Anatolî ye. Di derketina partiyê de şehîdên wekî Hakî Karer û Kemal Pîr cihê xwe yê bi rûmet girtine. Ew şerê bi diwartî tê meşandin, ji bo pêkanîna wesîyetên şehîdan e. Bi rengekî din jî, îro tola şehîdên Kızıldere û M. Suphî bi destê gerîla tê hilanîn. Jiyanê wan hemû şehîdan ji nû ve di Deryaya Reş de û di erdnîgariya Anatolî de ji bo ku heta hetayê bimîne, şîn dibe. Ev yek hêviyeke xurt û geş a şoreşa her du gelan li ser bîngeha jiyana sosyalîzma zanistî geş dike.

Gelê Başûr dagirker protesto kir

Hêzên Yekîtiya Neteweyî bi beşdariya sed hezar kesî meşek ji bo protestokirina PDK'ê û dewleta tirk, li hemberî avahiya Neteweyên Yekbûyî (NY) li dar xistin. Di meşê de dirûşmeyên wekî "Bimre hevkarîya bi dijmin re", "Bijî gerîla", "Bijî yekîtiya neteweyî", "Mesûd cehşê dijmin e" hatin avêtin



Li başûrê Kurdistanê şer di navbera PKK-Hêzên Yekîtiya Neteweyî û PDK-dewleta tirk de bi guraşî didome. Wekî tê zanîn şer di 14'ê gulanê de li ser banga PDK'ê, artêşa tirk ketibû başûrê Kurdistanê. Li gorî agahiyên ku me ji herêmê hildane dewleta tirk bi balafirên F-16 bombeyên napalmê bi kar tîne. Di encama wan bombaran de bi dehan sivil û bi dehan gundên kurdan hatine wêrankirin. Dewleta tirk berê jî bombeyên napalm û yên sofîner bikar anibûn. Her wiha kovara The Economist jî li ser bombeyên ku dewleta tirk bi kar anîne, rawestiyabû. Dîsa di 13'ê kewçêrê de bi bombebarandina balafirên dewleta tirk nêzikî çil peşmergeyî û bi dehan sivil hatine kuştin.

Li aliyê din Hêzên Yekîtiya Neteweyî bi beşdariya sed hezar kesî meşek ji bo protestokirina PDK'ê û dewleta tirk, li hemberî avahiya Neteweyên Yekbûyî (NY) li dar xistin. Di meşê de dirûşmeyên wekî "Bimre hevkarîya bi dijmin

re", "Bijî gerîla", "Bijî yekîtiya neteweyî", "Mesûd cehşê dijmin e" hatine avêtin. Li ser pankartên meşvanan wêneyên peşmergeyên ku di bombebarandina balafirên tirk de hatibûn kuştin hemû û wan jî NY xwestin ku dewleta tirk ji herêmê vekişe.

Çavkaniyên xwecihî radigihînin ku li derdora Gera Qesrê, Xanikan şerên diwar diqewimin û bi dehan leşkerê tirk û peşmergeyên PDK'yî di şer de hatine kuştin. Li warê Begovayê di encama şer de 3 PDK'yî hatine kuştin, 8 heb jî birîndar bûne. Li Haftanînê jî Hêzên Artêşa Rîzgariyê Gelê Kurdistanê (ARGK) hin girên stratejîk bidestxistine û di encama şerên giran de fermanarekî PDK'ê û 8 PDK'yî hatine kuştin. Gelek çekdarên PDK'ê birîndar bûne û gelek jî çekên PDK'yîyan ketine destê ARGK'ê. Li bakurê Kurdistanê jî ji ber sedema damezrandina 19'emîn salvegera PKK'ê gerîla li cihên cur bi cur livbazi pêk anin. Li gorî agahiyan di encama van livbaziyan de

bi dehan leşker û cerdevan hatine kuştin. Gerilayên ARGK'ê li ser riya Darelûka Amediyê kemîn li konvoya leşkerên tirk danî, di encama teqîna mayînan de du tankên artêşa tirk rûxiyane, 5 leşker mirine û 10 leşker jî birîndar bûne. Dîsa li navçeya Amedê li Hênê wesîteyeke leşkerî ketiye kemîna gerîla, di encamê de 10 leşker hatine kuştin. Her wiha gerilayên ARGK'ê li Adakliya Çewlikê jî konvoya leşkerî ketiye kemîna gerîla, li gorî çavkaniyan leşkerê hatiye kuştin û 7 leşker jî birîndar bûne. Li Şemzînanê jî gerilayên êrîş birine ser niqteyeke polîsan di dawîya şer de du polîs û leşkerê hatine kuştin.

Dîsa li çiyayê Garê di navbera gerîla û artêşa tirk de şer derketiye di encama vî şerî de 3 leşker mirine û yek jî birîndar bûye û li çiyayê Mazî û Dêrikê jî şer derketiye. Li aliyê din li gorî çavkaniyan roja 28'ê sermawêzê jî 7 PDK'yî hatine kuştin.

NAVENDA NÛÇEYAN

Kurtenûçe

Êrîşa ARGK'ê

Hêzên leşkerî yên artêşa tirk ji bilî operasyonên li başûrê Kurdistanê, li Bakur jî operasyonan li dar dixe. Li çoltera Dêrsimê gerilayên ARGK'ê êrîş birin ser hêzên tirk, di encama vî êrîşê de leşkerê mir, 6 leşker jî bi awayekî xedar birîndar bûn. Li hêla din leşker di navbera Lice û Darahenê (Genç) de li mayînan gerilayên qelibîn, di encama vî yekê de 2 leşker hatin kuştin. Her wiha li dorhêla Bedîsê di operasyonên leşkerên tirk de 3 cerdevan û bi dehan zêdetir leşker mirine.

Leyla Zana

Parlamentera kurd Leyla Zana der barê spekulasyonên serbest berdana xwe de ji Serokê Amerîkayê Bill Clinton û Serokwezîrê Tirkîyeyê Mesut Yılmaz re nameyek şand. Leyla Zana di nameya xwe de da xuyakirin ku ew nabe pêlîstîkê şerê psikolojîk û lewre jî serbest berdana xwe napejirîne. Zana di nameya xwe ya ji bo Clinton de dibêje ku gelê kurd her tim di bin pest û kotekiya dewletê de dijî. Ji bo girtina xwe ya di girtigehê de jî wiha gotiye: "Girtûbûna min ji bo aşî, biratî û "Tirkîyeke Demokratîk" bedeleke pêwîst e."

Îxlalên çapemeniyê

Konseya Çapemeniyê (Basin Konseyi) ragihand ku meha sermawêzê jî ji bo çapemeniyê bi berhevkirin, girtin û binçavkirin û derbasbûye. Di nîrxandina mehane ya konseyê de tê diyarkirin ku hê jî rojnameya Ûlkede Gündem ku di çin Kurdistanê jî hêla Qereqola Pirinçlikê ve tene desteserkirin. Di berdewama nîrxandinê de tê gotin kameramanê UBA'yê Aslan Eriç jî bûye hedefa êrîşan. Li hêla din di dema navborî de 5 rojnamevan hatine binçavkirin, 3 rojname û kovarek hatine desteserkirin, kovarek jî hatiye girtin.

Alain Makuwsky

Serokê Înstîtuya Washingtonê Alain Makuwsky, daxuyand ku li Tirkîyeyê tu parlementer û tu partiyên siyasî nikarin Bûyera Sursurlukê çareser bikin. Makuwsky ku ji bilî Wezaretê Derve ya Amerîkayê jî Artêşa tirk re jî şewirmendiyê dike, got ku wan bi gelek parlamenterê tirk û geraralên leşkerî re hevdiin pêk anîne. Di hevdiinê de wî jî parlamenteran re wiha gotiye: "Dev ji Sursurlukê berdin." Her wiha wî îdia kir ku artêşa tirk ji bo rûmeta xwe zêde bike dê di warê çareserkirina pirsê kurdî de gaveke girîng biavêje.

Tirkiye nikare ji bin barê şer rabe

Di hejmara meha sermawêzê ya kovara The Middle East de li ser paketa hikûmeta nû û çalakiyên karsazên tirk ên li Kurdistanê nivîsek hatiye weşandin. Nivîs bi giranî dîtin û ramanên rayedarên tirk dubare dike, lê di nivîsê de hin dîtinên balkêş jî hene. Bi taybetî gelê kurd bêhêvîbûna xwe ya ji paketa hikûmetê tirk anîne zimên. Her wiha karsazên tirk ji dane zanîn ku êdî Tirkiye nikare barê

şer hilgire. Bo nimûne Serokê TÛSIAD'ê Muharrem Kayhan dibêje: "Tirkiye nikare heta hetayê bi vî şerî bijî", pişt re jî Kayhan dide zanîn ku bi milyaran dolar li şer diçe, ew jî dibe sedema pîrbûna valahiya di butçeya dewletê de. Tê gotin ku valahiya heyî di sala 1995'an de %3 bûye, lê di 1996'an de bûye % 6,2.

Nivîskarê vî nivîsê John Doxey di nava nivîsê baweriyêke gelê kurd jî pêşkêş dike, li gorî baweriyê gelê kurd, karsazên tirk naxwazin Kurdistan ji aliyê aborî ve bi pêş bikeve, lewre dema rewşa gel baş bibê, wê alîkariyê bide hêzên dijber ên wekî PKK û îslamiyan. Dema mirov êrîşên li ser dezgehên seyar ên kurd û kuştina karsazên welatparêz bîne bîra xwe baweriyê mirîv bi vî ramanê xurtir dibe.

Di nivîsê de xaleke girîng jî ev e ku karsazên tirk pereyên xwe li derdo-

ra Riha û Dîlûk bi kar tînin, ev yek jî bi GAP'ê ve tê girêdan. Nivîskar Doxey bi van gotinan bal kişandiyê ser pêwistiya pejiwandina nasnavê kurdî: "Piraniya nîştecihên herêmê diyar dikin ku pêsketina aborî nikare şer bide rawestandî. Dîsa piraniya gel dibêje ku pêwîst e Enqere di warê demokratîkbûnê de hin gavan bavêje, nasnavê 12 milyon kurdî (ji pîncan yekê nîfûsa Tirkîyeyê) bipejirîne."

Di dûmahika nivîsê de tê gotin ku zagonên heyî rê li ber weşanên televîzyonê yên bi kurdî digirin, siyasethanên ku piştvanîya doza neteweyî ya kurdan dikin an tînin girtin, an jî ji qada siyasî tînin dûrxistin. Malbatên kurd zîlm û zorê dibînin da ku navên tirkî li zarokên xwe bikin.

Her çiqas nivîskar di dawîya nivîsê de dibêje ku bi başbûna rewşa aborî re wê bandora PKK'ê kêm bibê jî, ev gotinên wî jî aliyê gotinên wî yên destpêkê ve tînin pûçkirin. Lewre di destpêkê wî dabû xuyakirin ku bi dewlemendbûna gel, wê alîkariya PKK'ê zêde bibê, her wiha dîsa hatibû diyarkirin ku rewşa aborî ya "herêmê" berî şerê PKK'ê jî ne baş bûye.

NAVENDA NÛÇEYAN



Bi çavên Moltke **Romkela, Bêrecûk, Riha**

Li ser sewkiya kelayê
ava çend kaniyan di du
çiravan re digihîşt hev û
dora wan bi darên bî,
çinar û sewliyan hatine
bazingkirin; li nêzikî wan
medreseyeke bi gumez û
minareyên xweşik hatiye
avakirin.

Di nav ava zelal de
masîpankine nayên
hejmartin avjenî dikirin,
tu kesî jî newêribû tevî
wan bibe, her kesê ku jî
wan masiyan bixwara dê
nexweş biketa û kûr
bibûya, lewre ew masî
pîroz in.

Roja 6'ê avrêla 1838'an;

(...) Piştî çend saet rêwîngiya di nav
zevî yên birincê û sirtinê ne bilind re,
piştî ku me çemê Akderê derbas kir, em
ketin nav konine pir, ewên ku li ser piş-
tên sirtê û li destê komik bi komik wekî
gundan belav bûbûn. Me bi zehmetî
dargeha mîrê kurdan dozî (dît). Lê li da-
wiyê em il destêke piçûk rastî konêkî
mezin ku bi sed pêyan dirêj û bi qasî ni-
vî wî jî pehn bû, hatin. Ew axa, kalekî
rûspî û xweşik bû, ew gişt heybet û hur-
met bû, lê bi cilûbergên xwe gelekî ba-
sît xuya dibû. Wî hîn di derî de bi xêr-
hatina min kir. Hundirê kon (wekî he-
mû konên ji heriya bizinên reş) bi dîwa-
rên çitî koşk bi koşk hatibû parvekirin û
di wan de her kesî, xerîb, jin, hesp hêş-
tir, ga û bizin, cihê xwe dîtibû; di nîvê
kon de agirekî xurt veketî bû. Kurd her
tim li nêzikî daristanan dimînin, eger ne
wisa be ewê nikaribin li zivistanê (ya ku
wekî ya me sar û dirêj e), xwe di male-
ke wisa de bigirin. Diyar e ku aboriya
axayê me gelekî dedeyî (pedersahî) ye;
ewî nan şîr hungiv û penêr ji min re da-
nî û ew tenê wê demê rûnişt, gava ku
min rica jê kir. Her çiqas ew mirov dew-
lemend û xudanê 600 malî bû jî, wî tu
nişanên desthilatî û hebêta xwe dernedi-
xist; fermanên wî tu carî nedihatî red-
kirin; fermanên tirkên jî çênabe ku
destên xwe dirêjî karên hundirî yên van
xêl û eşîran bikin. Ev axa fermanê ne-

mañkirina her kesekî ji eşîra xwe, yê ku
gunehkariyek li ser bête îsbatkirin dide.
Dema ku axayek dimire, mafê paşê he-
ye ku ew cigirekî li şûna wî binav bike,
lê pêwîst e ew cigir her dem ji malbatê
be.

(...) Ancax li Gergerê ava çemê Mu-
radê ji nav diwarên tengî qûmî û daçikî
derdikeve; ji vir şûn ve Ferat xwe pehn
dike û diherike badan û lihevgerên fireh
û di ber kelaya Cihorêse re derbas dibe
û xwe digihîne bajarê Samosata yê nav-
dar; newal li wir fireh e û ev çem li vir
wek çemê Oderê yê li jorî Frankurtê, di-
be. Bernahiyên erqinê xweşik yên avê
pira xudê de heta bajêr, pênc saetan, di-
kişin; ev erqên avê kevanên xwe yên
pehn di ser geliyên piçûk re dişidînin;
berê bajariyan ji van erqan ava vexwa-
rinê dîkşandin. Îro bajarê Samsatê ne bi
qandî ji sedî bîstê bajarê kevnî Samos-
tayê jî ye; ji min re ecêb bû ku ez îro li
vir di nav enkûr û deriyên bi xentirme û
stûnan de rawestiyame. Min li vir çirtî-
kine mermerî yên hewqas xweşik dîtin
ên ku min di jiyana xwe de hîn nedîtî-
bûn, bi çirtikan pelên daran teyr û ga li
ser mermer hatibûn çêkirin, her tişt ew
qas ciwan hatibû parastin, mirov dikare
bêje qey ew niha hatine afirandin. Li ser
çiyayekî ku ji aliyê mirovan ve hatiye
avakirin, yê ku berê li ser piştê wî Ak-
ropolis hebû, hîna kaviîlên avahiyeke
çargoşeyî xuya dike. Li vir av bi aliyê
rojawa ve, ber bi Romkelê, heta kelaya

romanî Sigma an Zogma diçe; li vir be-
şê avê yê herî rojava pêk tê û berê li vir
pireyek li ser çem hebû, xuya ye ji ber
vê yekê romaniyan koloniyeye xwe li
vê devera bê rêk ava kiribûn. Mirov
ecêb dimîne ku li van çiyayên ji heşt he-
zar heta neh hezar pêyî bilintir rastî rê-
kine nerûxiyayî tê...

Romkela ji nişke ve dimeneke xwe-
şik ji mirov re vedike; di bin baran û le-
hiyê de roja 4'ê avrêlê me bi zehmetî
derbas kir û di destêke kevirî re em gi-
hiştin newaleke kûr û careke din Ferêt
singê xwe jî me re vekir. Di kûrahiyê
de, li jêr delava ku bi qasî sed gavan
teng e, ji nişke ve Rumkelaya bilind
derdikeve; hîn berî ku mirov bigihêje,
mirov di bajarekî re ku di zinêr de hati-
ye kolandin re derbas dibe. Ev kela jî ji
kevirine nerm, wek yên Maltayê, li ber
tavê danê hişkirin, hatiye avakirin. Çi-
yayên ve deverê hema her sal rûbirûyî
erdhejinê dibin.

Li Romkelayê pir zehmet e ku mirov
jî hev derxe, ka çi bi destê mirovan û çi
jî ji aliyê siruştê ve hatiye afirandin! Li
ser diwarekî zinarî sûreke ji kevirên spî
xwe bilind kiriye; bilindiya wê sûrê he-
ta şest pêyî heye, ew sûre bi dirang, birc
û qentirme ye. Di şêş dergayan re mirov
derbas dibe heta ku têkeve deriyê sere-
ke, yê ku derbasî çil xaniyan dibe; her
tiştê din wekî xerabiyekî ye. Ev xerabe
jî bi gelemperî mîna parçeyekî heware
xuya dike.

Gola Masiyan ya Rihayê



Dîroka Romkelê gelekî bihewas e.
Li demekê ev danîşgeha keşeyên erme-
nî bûye, yên ku li vir dêristaneke mezin
ava kiribûn. Hêza xerabeyê nikaribûye
ta roja îro van blokên kevirî yên çargo-
şe ji ser hev bavêje, tenê bazên romanî
yên ciwan û xweşik hinekî hatine xer-
mişandin û stûnên qalind li ser erdê di-
rêj bûne.

Di pey re mirovekî bi navê Dere Beg
li vir bûbû serdar, lê mîrekî kurdan ew
beg jî vê derê qewirand; di demeke din
de Baba Paşa li wî bajarî hikûm kiriye û
li dawiyê Îbrahîm Paşa ev dever da ber
topên xwe û ev kela ji binî de hilwe-
şand. Tenê diwar û zinarên bajêr, (wekî
di dema romaniyan de), di ciyên xwe de
mane.

BÊRECÛK

Rewşa Bêrecûkê hîna girîngtir e, ya
Rku kartan jê re "Birth û Bîr" digot.
Li vir çem ji newalên bilind dadikeve û
ji devgeha çem, li destê bi şûn ve ew jî
bo keştiyan dikare bête bikaranîn. Li vir
gerek bû rêka keştiyan dest pê bike, ya
ku di Ferêt re pêwîst bû bigihîştê Hin-
distanê û bûbûya pevgirêdanek keştiya-
niyê di navbera wê û Ewropayê de. Lê
ev karê bi rûmet yê serîpê Ceheşney bi
serî nebû. Li vir hîn bermayine wan xa-
niyan ên ku di dema wî de hatibûn ava-
kirin, hene. Tirkên bi hewas û sêr çiro-
ka aţşkayikên (qeyîqên agirî) wî gawi-
rî digotin.

Ev dever çaterêyeke mezin e, ji vir rê serast diçin heta Helebê, Antaqiya û Dîlûkê (Entabê). Li vir deşteke fireh û bi sirt ya dewlemend di navber Ferêt û Deryayê Spî de ye.

Ji Bêlêcîkê ber bi rojhilat ve tenê riyeke heye, ew jî riyeke ne baş e, ew di deşteke kevirî re diçe Rihayê û ji wir heta Amedê didome. Di navbera Libnan û Çiyayê Gawiran (gawirdax) de, bi tenê ev rîk ji welatê aşoriyan heta bajarên Sûrê û kenara Deryaya Spî heye.

Bajarê efsaneyan:

RIHA

Li ser riya Rihayê em li gundekî raketin. Li joriya Mezopotamiya, li deşta kevirî, wekî ku min berê nivîsîbû, tu ne darekê, ne kelemekê dibînî ku tu jê dakekî çixatê çêbikî, li vir mirov nikare pençek ax bibîne ku ew tê de giyayekî biçîne. Ji ber vê yekê mal li vir di pesarên qûmê de, li ser pozên sirtan hatine kolandin.

Riha, Êdêsa ya kevn, paytexta padîşahiya Osronê, di sala 216'an de bûbû koloniyeye Romaniyan û wan di bin rêberiya Sêvêrus de li aliyê din î-Ferêt bi saya kelayên Rihayê û Nisîbisê xwe ragirtibûn. Di dîroka dêran de Riha gelekî seyr e, ew seyrî ji ber sûretê Edêssa ye. Wekî tê zanîn di dema pêxember Îsa de sûretkêşî hîna belav nebibû. Ji ber vê yekê pir zehmet bû ku şiklê wî bête çêkirin. Lê di bîra xelkê de efsaneyeye sûrî dijiya. Di wê efsaneyê de tê gotin, ku padîşah Abgarûs hatibû vê deverê ku

pêxember Îsa bibîne. Bajarê Êdêssa ew ji qralê cihûyan parastibû û Îsa ew qral ji derd û kulan sax kiribû û wekî diyariyekê şiklê li ser desmaleke kitanî diyarî wî kiribû. Ermeniyên li sedsaliya pêncan ew çîrok red kirin û bi wî sûretî baweriya xwe neanîn. Lê îro ew baweriya xwe bi vê yekê tînin û ew efsane di nav xelkê de zîndî ye. Xelkê kaniyek li min mand (nîşan dan), ya ku di şikeftê de hatibû veşartin û nêzikî çaryek saetê li rohilatê bajêr bû. Li gorî çîroka hevaldarê (qasid) min, ew kesê ku sûretê Îsa hildigirt nêzikî li dîwarên bajêr kiribû, dema ku komek ji siwaran li ber wê kaniyê gihîştibû wî. Wî xwe di kaniyê de veşart û di wir de jî hişk bûbû, bû kevir. Her wisa ew sûret bi sedsalan winda bûbû û nenas mabû, ta ku ebebozan (keşe) ew dîtibûn û bi dinyayê dabûn naskirin. Sûretê ecêb û pîroz bajarê Êdêssa diparast û gerek bû tu dijmin wî bajarî dagir nekin. Bajar du caran xwe li dijî çemkerkirina farişên di bin serokatîyê Noşîrwan de parastibû, lê ereban Riha dagir kirin û ew pîroztiya sêsed salî di êsîriya wan gawiran de hatibû "zelîlîkirin", heta ku rojekê qralê Konstantînopelê ew sûretê pîroz bi 12 hezar lîbreyên zîvîn û du sed êsîrên misilman kiribû. Sûretê jî Êdêssa gavberiya (pêşbirkê) gelek sûretên cihanê dikir, wekî Vêronîka û gerek niha li bajarê Gênuha be.

Riha hîna jî şarekî mezin û bedew e, hemû ji keviran hatiye avakirin, û hawirdor bi dîwarekî bilind hatiye girtin û li ser rîş û zinarên bilind kelayekê cihê xwe girtiye. Li ser kelayê du stûnên

berz bilind bûbûn, lê belê ew ne monolît bûn û seriye wan bi bazên romanî xweşik hatibûn xemilandin. Dîwarên avahî û minareyekê nîşanî dîrokekek kevnar dikirin, ew li hundirê bajêr bi kevirên çargoşeyî yên mezin û bêcelb û siwax li ber hev hatibûn rêzkirin. Li ser sewkiya kelayê ava çend kaniyan di du çiravan re de digihîşt hev û dora wan bi darên bî, çinar û sewliyan hatiye bazîngîkirin; li nêzikî wan medreseyeke bi gumez (qube) û minareyên xweşik hatiye avakirin. Di nav ava zelal de masîpankine (şebot) nayên hejmartin avjenî dikirin, tu kesî jî newêribû tevî wan bibê, her kesê ku ji wan masiyan bixwara dê nexweş biketa û kûr (kor) bibûya, lewre ew masî pîroz in.

Riha li ser zinarine rût dimîne, lê ji vir û şûn de, ber bi başûr, çol an sehra dest pê dike, ew dûziyeke bêdawî ye û niha bi rengê şîn hatiya rapêçandin û di demeke nêzik de dê ziwa bibe. Riha bi darên bî û fêkiyên xwe çoladayeye (xênar an wahe) di navbera sehayên qûmî û kevirî de ye. Şerîf Paşa yê du hespên komêt, bi awayekî pir dostane bixêrhatina min kir; pêwîst bû ku ez li ba wî bînim û herçiqas ku in bû jî, wî ji bo min cirît û fêrbûneke bi êgir (yanê listikên bi êgir) li dar xist.

Ji Rihayê heta vir, Amedê, cihê ku ez nameya xwe lê dinivîsim, deverê gelekî xemgîn e, deverê ji vî xemgîntir nayê bîra mirov. Ji bilî bajarê Siwêrêkê, tenê çar gundên din li ser vî rîya çil saetî a dirêj rastî min hatin, ewên din gişt hema komên ji keviran bûn û li zivîstan ereb tê de bi cih dibin.

Heta nîvê şevê û li ber ronîya heyvê ez li ser piştê hespê bi rê de bûm û min ev devera xemgîn dibirî. Kêm kêm mirov rastî komek ji siwaran dibû, yên ku rimên dirêj hilgirtibûn û me şilav li hevdu vedigerandin. Car caran me keriyek hêstir didît, yên ku di nav keviran de bi dijwarî li xureka xwe digerin. Li tenîşt wan konên reş ên şivanan xuya dikirin. Surucî yê me jî her ew stran digot, ya ku her dem bi "Aman! aman!" dest pê dikir û temam dibû, ew star her tim yek qeyd û deng bû, çî li ber Ferêt, û çî li ber Donau, yek caran wisa dibû, wekî ku ez di xeweke sivik de bîm û lazim e ez ji wê xewnê hişyar bibim; Ma eceba bi rastî ez li Mezopotamiyayê me!

Li vir hema çiya gişt xweşik û ciwan in; min di navbera Ferêt û Dicleyê de bi tenê çiyayek dît, ew jî çiyayê Qerejdaxê bû. Piştî du roj rêwîti û di deverêkê kêm şînahî û ne pir bi kelem re, em ji nişke ve gihîştin navçeyêke bi berf ku sarbûna wê ne zêdetirî 3-5 dereceyan bû, mirov wisa fikir dikir ku ew li deşteke dût e, lê ne wisa bû, em li deverêke bilind bûn û bilindî li vir digihîşt pênc hezar pîyî di ser rûyê behrê rê; ev dever bi hewayê xwe ya ne xweş bi bi navûbang e. Ez gelekî zû bi rê ketibûm û dema ku min şeyê çiyayî (rêzeçiya) derbas kir, ro teze ji paş çiyên ve derdiket û Dicle di nav tirêjen sorik de vedibiriqî. Li nîvrokî bi horîna ewr û birûskan re û di bin baran û zîpikan de ez gihîştim Amedê. (r.225-233)

AMADEKAR:

DR. KEMAL SÎDO-KURDAXÎ

Ji Kurdistanê rev

FAYSAL DAĞLI



Li Başûrê Kurdistanê şerê di nav koalîsyona Soran û PDK'ya hevkarê rejîma Enqereyê de qediya. Di wî şerê ku çend hefteyan ajot de, nêzî du hezar kurdan jiyan xwe winda kirin û bi sedan kes jî seqet, sêwî û koçber bûn. Paşê her du aliyan jî çema stûyê xwe xurandin û paşve kişiyên heremên bin desthilatiya xwe. Niha pîrsek tê bîra mirov. Gelo wan ji bo çî û çîma ewqas xwîna kurdan rêtin û bûn sedemên ev malwêranyê kî, çî bi dest xist? Di nav van mirî, seqet, sêwî û koçberên şer de kesên ji malbatên mîrê Behdînan û mîrê Soran hene, gelo?

Belê bersiva van pîrsan careke din destnîşan dike ku ev şerê di nav her du mîran de, ji bilî bidestxistina desthilatiyê ne tiştekî din e. Lê desthilatiyekî bi xwîn, bi îxanet ku li pişt xwe cesedan, koçberan, wêraneyan û sêwîyan dihele. Ev îxanet û şerê desthilatiyê dibe sedem ku vî carê jî, Kurdistan bi destê

kurdan tê wêrankirin.

Encameke şerê mîran jî ew e ku bi hezaran kurd êdî ji welatê xwe direvin û bi hezar zahmetî xwe diavêjin Ewropayê. Çendakî berê me li Yewnanîstanê baregehên koçberên Barzanî û Talabanî ziyaret kir. Sê hezar kurdên ku di rewşa dîlên şer de ne, li Yewnanîstanê bîewlehî, bêstare û bêpêşeroj têkoşîna jiyane didin. Yek ji van koçberên hêvîşikestî hestên xwe wisa dianîn zimên:

"Em kurd, ji jiyane tiştek fêr bûn. Mirov dikare li dijî gelek tiştan li ber xwe bide. Zilmên ku dijmin li me kir, me ew bi tewekûl kişandin. Em mirin, birîndar bûn, bi berxwedan koç kir, lê me bawer dikir ku welatekî me heye, heta em welat rizgar bikin, pêwîst e ku em van êşan bişkînin. Belê me nihayet welat rizgar kir. Gelekên malbata min hatibûn kuştin. Mala me ya li Kerkûkê piştî raperîne jî di bin dagira dijmin de mabû. Me got, hemû Kurdistan a me ye. Şeş salan em li Hewlêr man. Du salên me di bin çadîran de derbas bûn. Kar tunebû, xanî tunebû. Her birakûjî û şer didomîya. Em carina birçî, carina tîr bûn. Alikariya ku Netewên Yekbûyî dida me jî ji aliyê partîyan ve dihat dizîn û firotin. Bi dehhezaran xizanên wekî me hebûn.

Lê di biyaniyekî de me dît ku pêşmergeyên li debabeyên (tanq) dijmin siwar bûne, hêrîştî Hewlêrê dikin. Êdî her tişt

qediyabû ji bo me. Yan emê bibûna aligirê zalimekî, an jî yê din. Ger em bibûna dest û pêçiyên zaliman, malbata me kî û çîma kuşt? Lingê min ê rastê kî fêl kir? Yanzdeh salan min li deşta Hewlêr û Kerkûkê pêşmergeyî kiribû. Min biryar da ku ez êdî li wê Kurdistanê ku ez gav bi gav lê jiyabûm, nemînim.

Belê vî carê jî me xeyalên xwe bi ser de dan. Ew welatê ku ji bo rizgariya wê me xwe avêtibû agir, êdî ji me re bûbû cehenem. Ji bo ku em jê rizgar bibin me xwe avêt agir. Şerê navxweyî û îxanetê êdî manewiyata me şikand. Ji bo ku ji wê Kurdistanê ku min di rîya wê de lingekî xwe û malbata xwe û salên xwe dabûn, bifilitim, bi mehan ez geriyam. Di metropolên dijmin de bêav û xwarin, di nav zeviyan mayinkirî de li ber serê mirinê geriyam. Di encamê de min xwe avêt Yewnanîstanê. Wekî hûn dibînin, bi hezaran kesên wekî min hene. Hemû ji Kurdistanê azad direvin. Ji bo ku ji Kurdistanê xelas bibin hemû tiştên xwe firotin. Li vir tenê bi alikariya xêrxwazan em dijîn. Ger ez derfetê bibînim, ezê herim cihêkî ku hîzûra min hebe. Ez dixwazim herim cihêkî ku tankên bi kemnikên zer xemilandi nebînim û selajên ku bangî cenazeyên miriyên birakujîyê dikin, nebihtîzim." Belê, ev gotin ji Mesud Barzanî û Celal Talabanî re îthaf dibin...

Roşniya çimê ma:

Adnan Işık



Ez qandê rojnameyê Özgür Gündemî, sera 1993'in de menga kewçêr û sermawez de şaristanê Kurdistanî de xeftiyawa. Amed, Batman, Riha, Antep, û Wan de menda. Ê rojan de, Kurdistan de xeftiyayin zaf zahmet bi. Koyan de lecê gerîlay û artêşa tirkî, hergî roj gird biyê. Artêşa tirkî tanq, top, teyare û firoke û hazarana leşkeriya Kurdistan de vardiyayin viraştê. Artêşa tirkî, çend ke gerîlan ra kotekî werdê, hend jî sivilan ra heyf girotê. Artêşa bandorkaran, şarî ra hezarana merdimî jew jew remnayê û kiştê, yan jî vinî kerdê. Hîrê, çahar hazara dewî xilnayî, yan jî veşnayî. Kurdistan de bax û baxçe nêmend, pêro jî veşa. Artêşa tirkî mezeli ca de weş nêverdayî. Sûkî dayî topan ver. Şîrnex, Lice, Qulp û zewbî şaristanî çend finî pêsero xilnayî û veşnayî. Ê rojan de, qeçê adirî û gerîlayê reyayinî rîçikê xelasbiyayinî eyştê şarî miyan. Ewro jî, a rîçik, tewrî bena gird û bena berz.

Mi we Adnan ra telefon de çendî finî qisey kerdîbî, la belê ma pê nêdîbî. Ancî vengê ci ra, xulqê Adnanî weş aysiyayê. Ê rojan de ma her gi roj, çend finî pêre telefon akêrdê. Çirê ke dewleta tirkî nêverdayê rojname ma Özgür Gündem, Kurdistan de vila bo. Cok ra ma her gi roj jew babeta rojname rîştê şaristanê Kurdistanî. Ê şaristanan ra jew jî Wan bi.

Wan de hîrê embazî rojname vila kerdî. Adnan Işık jî înan ra jew bi. Hîrê embazî jî qandê vilakerdina rojnamî bol weş xeftiyayî. La belê fina jî, problemê vilakerdinî estîbî. Embazan se kerdê- nêkerdê dewletî destnayê rojnaman ser. Şaristan miyan de, polîsî û embazê ma yê ke, vilakerdeyî, zey pising û meran pê peynî de geyrayê. Polîsan, embazî; embazan polîsî, rind silasnayê. Rojnameyî rojê vila biyê, ancî rojê jî polîsan dest nayê ser. Xora çend mengî verî jî, vilakerdê rojnamî Embaz Orhan Karaağar, kontrayan kiştî ra şehîd kewtbi. Fina jî embazî weş xover dayê. Nê rojan de ez şiya Wan. Bülent, Celal, Meşrûq û Adnanî ya piya, ma pêseramayin viraşt. Pêseramayin rojê ramit. Ma heminan jî pêserameyin ra zerî girot. Ma kêfa vatê: "No fin vardayinê dişmenî yo veng bivejyo." Bi şewra ez aygeyrawa Amed.

Embaz Adnan, dawa PKK ra newe zîndan ra vejîyabi. Hem binçim de, hem jî zîndan de, bol weş xover da bi. Çarê çî akêrdebi û bawerî dayê emzananê xo. Zewciyayebi û hîrê qeçê ci estbi. Ma pêserameyin de zaf kar nabî milê ci sero, la belê hesê xo, nêvetbi. Roja bîn min ci rê vat: "Embaz ti zewciyayeyê û qeçê to estê, eke karo ke ma dawo to, eke to rê zêde (veşî) yeno nika ra vaje. Her gi roj jew embazê ma şehîd kewno. Ma heme çî ra jî fam kenê, wa xeberê to bibo." Wexto ke

min winî vat, Embaz Adnan qahriya û wina vat: "Her gi roj Kurdistan de şerwanî şehîd kewnê. Nîna heme, ne rojnamegeriyê û ne jî rojname vila kenê. Kam birûmeto, dişmen nano pa. Eke ma de rûmet esto, ma çî kar bikerê jî, dişmeno ma wa no. Bewn embaz, dişmen şew û roj kewno ma pey ke, meviradê ma rojnaman vila kerê. Çend ke ma dest ra yeno, ma yê jî rojnaman biresnê wendoxan. Wexto ke ez jewerî resnena wendoxan, o roj wirî kêfweş bena ke nêşena biyarî ziwan. Ewro no rojname wo dîroka ma kurdan nano ro embaz." Wexto ke Adnanî qisey kerdê, ez vana qey ke perayê. Min xo jî ey ra zerî girotê û xorî ra biyê kêfweş. Min xo zere de wina vatê: "No fin dişmen se bikro jî, êyê nêşê ma vindarnê. Mayê herema Wan de, rojnaman vila kerê. Meşrûq, Celal û Adnan hîrê heme jî zey adirî yê."

Embaz Adnan sûk miyan de rojnamey vila kerdê. Ey tenya se rojnamey saetê miyan de kerdê vila. Se rojnamey şarî miyan de ameyê wendin. Wexto ke şarî Özgür Gündem wendê, xeberanê raştî mûsayê û zûriyê dewlet vînayê. Coka polîsan, çend finî ray ra abirabi û ci rê wina vatbi: "Mayê rojê, meytî to nê rojnaman bind de binimnê, wa xeberê to bibo." Adnan jî winan vano: "Axirî ezo rojê bimîrî, eke merdinê min şima dest ra bêro, o wext ezo bibî bêmerde û şarê xo ra rûmet bigîra." Embaz Adnanî çimê xo çiyê ra nêkûwitê. Ey het de, qîmetê dişmenî hîrdê mêşê jî çinêbi. Çirê ke, înan jî winî weynayê şarê ma ro. Wexto ke mi ci rê vat bi: "Embaz zaf tenya megeyrî, jew embaziya bixeftiyî." Embazî min rê wina vatibi: "Ez miqayitê xo bena, la belê îna biwazê, ê şenê heme ça de jî çî bikîrî. Çirêke mîa sivilî me embaz."

Çend rojî tepiya ez Riha ra şiyê Amed ke, Hilwan de polîsan tepiştê û nêzdiyê hîrê saetan vindamawa. Cok ra berey resawa Amed. Roja 27'ê sermeweza 1993'in bi. Kurdistan de alarm wo gird estbi. Çimke 27 sermawezî de PKK awa bibi (niya wa ro). Saet newê şewî de ma buroyê Amedî de ronîştê ke, Stanbol ra telefon ame. Ê telefonî de embaz Kenan Azizoglu wina vatbi: "Ewro şan de kontrayan nawo Adnanî ro, wa xeberê şima bibo. Eke şima şenê şirê Wan, rind beno, çimke vewrî ra teyarey nêwerzenê û ma şewra nêresenê." Min telefon rona û

embazê ke Amedî ra vat: "Bewnê eke otobosî werzênê, mayê şirî Wan. Ewro kontrayan dayê embaz Adnanî ro." Jew embazî telefonê cayê, di cayan kerd û vat:

"Fîrmaya Van Gölü de ca esto." Ma çahar embazî, a şew şim Wan. Vewrî ra otobûs zarzor ray şiyê. Ma şewra rew resayê Wan. Roj akewt tepiya, ma şiyê buroya ma yê Wanî. Embaz Bülent Çiftçi, İrfan Uçar, Adil Harmancı û embazê bînî o ca (wîja) de biyê. Embaz Bülenti vat: "Ma şan ra meytî embazî dayî herî. Çimke parlamenterê HEP Remzi Kartal û zewbî şexsiyetê silasnayey ewtiya de biyê, înan jî winî waşt." Şarî embaz Adnan, serwedarnayewo girdiya hewadawo û dawo her. Polîsî mabendê wêdarîna meytî de, embazê Adnanî rojnameger İrfanî genê binçim, danê piro û ci rê wina vanê: "Mayê zey goniya Adnanî, goniya şima hemin birijnê. Axirî şima kurd niyê?" Nay ra jî ayseno ke dewleta tirk, çimanê dişmenay ra ewneno ma kurdan ro.

Ma buro ra şim, kê Adnanî oca ra jî şim mezalan ser û mezeli Adnanî ziyaret kerd. Ma çend gulekê sûrî sereyê embaz Adnanî ver ronayî û ageyray kê ci. Ceniya Adnanî, kiştowê Adnanî dîbî. Ay diyinê xo wina ardê ziwan: "Saet mabenê panc û şeş bi, roj qelibiyêbi û werte bibi tarî. Ez jî teber de, kêberî ver de vinderbiya. Min weyna ke Adnano vernî de û peydê ci de jî, jew xort rew rew yeno. Xeberê Adnanî çiyê ra çinêbi. Tayn mend bi ke Adnan bireso mi, xorto ke peynî ra ameyê, finê ra dabanca xo vet û na sereyê Adnanî ro. Wexto ke ey da Adnanî ro ez remaya ci ser, la belê min vernî de zivirê û piheta vazda. Min pey ra ewna ke kiştowê Adnanî nişt jew pikab û rema: Ma Adnan bêrd nêweşxane, la belê o ray de şehîd bî. Min kiştowê Adnanî, dozger rê da silasnayin, la belê ey goş-nêda vatenanê min û min rê vat: 'Mekewî Adnanî pey, şo qeçikanê xo miyan de roşê û kiştowî xo vîra biker.' Eza senî Adnanî xo vîra bikirî embazino."

Bahdo vejîya werte ke, kontrawo ke namê ci Murat Demir o, embaz Adnan kiştô. Murat Demirî heme ca de jî vat: "Waliyê Wanê, ê wextî Mahmut İlbaş ferman da min û min jî Adnan Işık kişt." La belê qanûnê tirkî Murat Demirî ra persê Adnanî nêkerd. Çimke Qanûnê tirkî, qandê embaz Adnanî û qandê ma kurdan bibi fermanê mergî.

ZÜLKÜF KIŞANAK

□ 10 berfanbar 1948:

Roja Mafên Mirovan a Navneteweyî

Danezana Mafên Mirovan a Cîhanê di roja 10 ê berfanbara 1948'an de hate ragihandin. Piştî du salan ango di sala 1950'an de, ev roj wekî "Roja Mafên Mirovan" hate pejirandin. Tirkiye di sala 1949'an de tevahiya xalên danezana mafên mirovan îmze kiriye. Lê li gorî pîvanên danezanê tev-nagere. Wekî rûdaneke balkêş di 10'ê berfanbara 1993'an de Rojnameya Özgür Gündem'ê li Stenbolê hate dagîrkirin. Bi sedan xebatkar hatin binçavkirin û girtin.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

Gündem


□ 12 berfanbar 1918:

Kurdistan Tealî Cemiyetî ava bû.


Piştî salên 1900'î û vir de bi taybetî li Stenbolê gelek sazî û rêxistinên kurdan ava bûne. Yek ji wan jî di roja 11'ê berfanbara 1918'an de bi navê Kurdistan Tealî Cemiyetî (Komeleya Serbilindkirina Kurdistanê) hate damezirandin. Ev komele piştî 30'ê kewçêra 1918'an ku peymanagîrbestê ya Mondrosê hatibû îmze kirin, ji aliyê Saîd Abdulqadir û hevalên wî Nuseyin Şukrî Beg (Baban) Dr. Mihemed Şukrî Beg, Muhîddîn Namî, Aziz Beg û Babazade Hikmet Beg hatiye damezirandin.

Sekreterê Giştî yê PSK'ê Kemal Burkay:

Em ne li dijî şîdeta bindestan in



Maşallah Öztürk



Kemal Burkay

Sekreterê Giştî yê Partiya Sosyalîst a Kurdistan Kemal Burkay daxuyand ku, ew tu carî li dijî berxwedanên kurdan derneketine, bi çekdarî be jî. Burkay di axaftina xwe ya di bernameyê de wiha didomîne: "Em çawa li dijî van berxwedanan derkevin, ew berxwedanên gelê me ne. Şerê çekdarî heqê wan e. Me tu carî negotiye ku şer ji bo kurdan hêram e, miletên ku bindest in, heqê wane ku li dijî zulmê li berxwebidin".

Sekreterê Giştî yê PSK'ê Kemal Burkay roja 1.12.1997'an di MED-TV'yê de beşdarî bernameya zindî ya bi navê "Dîalog" ku ji aliyê Maşallah Öztürk ve dihate pêşkêşkirin, bû. Di bernameya zindî de Kemal Burkay li ser şerê çekdarî û rewşa Kurdistanê rawestiya. Li gorî Burkay, destpêkirina şerê çekdarî li Kurdistanê zû bûye. Dîsa Burkay dadixuyîne ku, siyaseta partiya wan cuda ye; jî bo gelê kurd zirarê nebîne, gund neyên şewitandin, wan dest neavêtiye çekan. Li aliyê din Maşallah Öztürk jî li ser vê daxuyaniya Burkay diyar kir ku, kurdan kengî dest bi şerê çekdarî kiribe dewletê êrişên dijwar birine bi ser wan. Her wiha Öztürk, bi minakan da zanîn ku şerê çekdarî ji bo gelê kurd pêwîstiyek bûye. Li hemberî van minakan Kemal Burkay pejirand ku destkeftiyên şerê çekdarî hene.


Di bernameyê de li ser daxuyaniyên PSK'ê yê di salên 1993'yan de jî hate rawestîn. Maşallah Öztürk daxuyaniyeke ku di

sala 1993'yan ji aliyê Kemal Burkay ve hatibû dayîn, bi bîr xist. Di vê daxuyaniyê de dihat gotin, "Em jî dikarin dest bi şerê çekdarî bikin." Maşallah Öztürk jî Sekreterê Giştî yê PSK pîrsa, "Ji hingî hetanî vêga çi guherî ku we dest bi şerê çekdarî nekir?", kir. Li ser vê yekê Burkay wiha bersiv da: Ger partiya me rahêje çekan mafdar e. Lê me ev yek di wextê xwe de nekiribû. Amadehiyeke me ya bi vî rengî jî nîn e. Lê PKK'ê dest bi şerê çekdarî kiriye, em jî karên siyasî û diplomatîk dimeşînin." Her wiha Burkay dibêje ku ev her du ne li dijî hev in û berdewam dike: "Me tu carî dijayetiya PKK'ê nekirîye, em her dem dibêjin ji bo ku pîrsgirêka kurd bê çareserkirin divê PKK li derveyî vê danûstandinê nemîne. Dêrde me ne ev e ku dewlet bi me re rûne, dêrde me çareseriya kêşeya kurd e, ji bo vê yekê jî divê me hemû rêxistinên kurd tevli vê pêvajoyê bibin."

Li ser pîrsa Öztürk, Burkay kongreya neteweyî wekî gaveke mezin bi nav kir, lê ji bo vê yekê xwest ku rêxistinên kurd şerê hev nekin, yekîtiya xwe xurt bikin, neyên listikên dijmanan.

Li gorî ramana Sekreterê Giştî yê PSK'ê Burkay, heta kêşeya kurdî çareser nebe, li Rojhilata Navîn aramî pêk nayê. Li gorî baweriya Burkay Amerika û Ewropa dixwazin kêşeya kurdî çareser bikin, lewre berjewendiyên wan dewletan vê yekê divên.

NAVENDA NÛÇEYAN

ÇAVDÊRÎ**Xoybûn û Xayintî**

MÎRHEM YÎÇÎT

Her netewe bi aliyekî xwe navdar e; alman bi disiplîn û mîltarîzma xwe, tirk bi barbarî û talankerîya xwe, îngilîz bi xwîn-sarî û diplomasiya xwe, cihû bi aqil û şarezahiya xwe tene nasîn. Şoreşgerên mezin ji Fransa, Rûsya û gelek welatên din derketine. Hin welat bi filozofên xwe, hin bi opera û zanîngehên xwe û hin jî bi hunermend, artist û rejîsorên xwe derketine pêş.

Xisletên kurdan jî hene. Mirov dikare bêtifaqî û organîzenebûyî û jihevheznekirin û pêşî û dawî xafilî û xayintiyê bihêjmêre. Kurd xafil in, bi xwe re xayin in.

Xafilî û xayintî lawaziyek neteweyî ye. Kurmîtiya navxwe ye. Daqoqê hundir e. Xayintî bûye sebeba şikestina kurdan. Xwîna kurdan ji ber destik û altaxiya dijmin rijiyaye. Kurd bindest mane û hê jî bi ser neketine. Xayintî xetereya berdewam e, li Kurdistanê. Berê şexsan xayintî dikir. Îro mezintir û kujindetir bûye. Bûye parti, bûye rêxistin û siyaseteke çekdarî li welatê me. Ev hêz, îxistin, serokayeti û siyasat giş di nav PDK de civiyane.

Dewletên dagirker xayintiyê tim tev didin, han didin û ji bo jiyandina wê, çî ji destên wan tê dikin.

Heger em salên piştî şoreşa Pekekê deynin aliyekî, li welatê me çu carî şerê xayintiyê bi xurtî û bi plan nehatiye kirin. Ev jî bûye hoyaya temendirêjiya xayintiyê û mezinbûna xetereya wê.

Hêjayî gotinê ye ku ewil rêxistina Xoybûnê li ser xayintiyê û xayinan bi rengekî cidî radiweste. Cara ewil di platformeke neteweyî de zêde neketibe jiyanê û şeklî jî mabe, pîrsa xayintiya navxweyî munaqesê dibe, sondek tê qebûlkirin û cezakarîna mirovên xayin dibe biryar.


Ev di dîroka berxwedan û siyaseta li welatê me de qewmîneke nû ye. Hişmendiya beramberî xayintiyê û nişmîtiya der barê wê de, bi Xoybûnê jî diya xwe dibe. Li gorî ku Garo Sasunî dibêje Xoybûn ceza-yê ewil jî dide mirovekî bi navê Bekirê Hecî. Bekirê Hecî endamê Civîna Neteweyî ya Araratê bû. Wî qerar û bangên serokayetiya şoreşa Araratê xistibûn bin piyan, çûbû xwe spartibû dijmin.

Heyf e ku Xoybûn nebû hêzeke wiha ku bikaribe xayintiyê bigire bin kontrolê û xayinan ceza bike. Qeweta Xoybûnê negihîştîyê vê yekê. Heger wê rojê ango berî niha bi 70 salî Xoybûnê bikaribûya dor li xayintiyê bipêça, ew bixista asêgehê, ev tolerans û sersariya ku ewil di nav rewşenbîrên kurd de heyê û di riya wan re bûye xerabîrîn xisletê neteweyî, dê çênebûye. Kurd jî dê li cihekî birûmettir bûna û xayintiya nav me jî ew çendî mîna îro dê har û qelew nebûya. Ji ber vê jî Xoybûn nebû otorîte û piştî çend salan zû ji bîra bû. Ev kar jî wekî bi sedan erk û karên din mane li bendeyî şervan û şoreşgerên Pekekê.

Şoreş îro di nav şerekî pîralî de ye û cepheya li dijî xayinan jî ji her carê germ û gurtir e. Rast e xwîn dirije û xwîna her du alîyan jî ya mirovên kurd e. Ji riya şer û berxwedana li dijî xayintiyê pê ve riyeke din hebûya dê gelekî baştir bibûya. Her tişt bi ya daxwazê nabe. Rastî û realîte li daxwazan nanêre. Ew xwediyê qanûnên xwe, taybetmendî û xweseriyan xwe ye. Ya baş ne gazin û girî, tevlîhevîkirin û helwestne-girtin e, ji hev derxistina xayintî û welatparêziyê ye. Qonax vê dixwaze. Qonax fikirkirina zela û sayî, helwesta diyar û bi biryar ferz dîke.

Sererastkirin: Di hejmara 96'an nûçeya Baha Şêxo de, bi çewtî hatiye nivîsîn ku, Şêxo stranên Seîd Yûsif gotin, em xeletiyê sererast dikin, ji hunermend Baha Şêxo û xwendevanan lêborînê dixwazin.

'Ji bo aştiyê mî



Birêz Belli hevdişina we û Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, bala raya giştî ya şoreşger û welatparêz kişand ser xwe. Li ser vê yekê hûn dikarin çi bibêjin?

♦ Demeke dirêj me hevûdu nedîtibû. Baş çêbû. Me pirsar hev kir. Öcalan wekî berê bi ços û dilgeş e. Mirovekî gelekî xebatkar e. Wekî hin kesan bi tenê piştî xwarinê bi politikayê re mijûl nabe. Bi şev û roj şoreşê difikire û lê hûr dibe. Em li malê wekî dostekî li hev rûniştin. Jixwe gotûbêja me di televîzyonê de hate weşandin. Wekî din tiştekî bê gotin tunne ye.

Daxwaza hevdişinê kê kir?

♦ Min nekir. Lê min bi dilxweşî ev dawet pejirand. Ji ber ku bi nêrîna min, bi kesên girîng, ku di nav dirokê de cih digirin re hevdişin tiştekî girîng e.

Bi taybetî di van salên dawîn de we li ser pêwîstiya yekîtiya kurd û tirkên de gelek gotar nivîsîne, lê li holê zêde tiştek nîn e, çima?

♦ Mixabin, gotinên me her dem li ser zimên û kaxîzê man. Lê, hêviya gelan li ser bingeha wekhevî û azadiyê yekîtiyê xurt e. Divê bersiva vê hêviyê di warê politîk de bê dayin. Ji ber ku beryê yekîtiyê ev hêvî pêk nayên. An na emê di nav avzêlekê de bigevizin û di dawiyê de jî bifetisin.

Çepgirên marksîst ji bo ku ji marjinaliyê bifiltin pêwîst e bi tevgera kurd re hevkarîyê bikin. Piştî vê yekê ne benda %10 û ne jî tiştekî din dikare li pêşiya me bibe asteng. Di warê legal de partiyên wekî HADEP, ÖDP, SİP, EMEP, û BP hene. Her wiha gelek sosyalîstên ku di nav partiyên de cih nagirin hene. Ev jî mirovên me ne. Dîsa saziyên demokratîk, sendîka û tevgerên aşîxwaz jî hevalbendên me ne.

Hûn dikarin rola HADEP'ê û pîvanên hevkarîyê berbiçavtir bikin?

♦ Bêguman HADEP di nav vê hevkarîyê de cih digire. Her çiqas ji ber rewşa xwe ya taybet li gelek bajarên herêmê bûye partiya yekemîn jî, lê ev yekê li ber Tirkîyeyîbûna HADEP'ê nagire.

Di rewşa îroyîn de, em nikarin di bin banekê de yekîtiyêkê ava bikin. Jixwe daxwaz û hêviyên bi vî rengî dûrî rastiyê ne. Lê avakirina koordînasyonê wê gelekî baş be. Wekî min li jor jî anî zimên hevkarîyê bi vî rengî gelekî girîng e. Ev hevkarî wê ços û dilgeşiyê gelekî mezin bide gel û bend jî bi kêrî tiştekî nayê. Wê tevgera gel wê bide ber xwe bibe.

Wekî minak ez dixwazim anketa serkaniya giştî ya artêşa tirk bi bîr binim. Di vê anketê de rêjeya dengên (rey) HADEP'ê wekî jî % 6.4 hatiye diyarkirin. Bi kurtasî, ku îro hîlbijartina giştî pêk bê, HADEP nikare bikeve nav meclîsê. Ji ber vê yekê serkaniya giştî ya artêşa tirk têbîniya dijberiyê (muhalefet şerhî) daniye û gotiye bila bend nebe %5. Li aliyê din ÖDP'ê jî di nav de rêjeya dengên partiyên din jî %1 e.

Baş e, divê şewaze politîka meşandinê çawa be?

♦ Divê em balê bikişînin ser awayê li dijî pergalêbûna xwe. Hûn dikarin qala şoreşgeriyê bikin û bibêjin em ji bo kêşeya kurd çareseriyê aşîyane dixwazin. Lê ji bo pêkhatina aşîyê mûxataba kî ne? Bêyî diyarkirina mûxataban daxwaza aşîyê dikare bi kêr be? Aligirî "Aydînlîk"ê jî dibêjin em aşîxwaz in. Di şerê rizgariyê (Kurtuluş Savaşı) de tirk û kurdan mil dane hev. Ku ev hevalbendî nebûya, şerê rizgariyê, ji çend berxwedanên milîsan pêk bihata, ey tiştekî gelekî girîng bû. Niha jî ev tişt pêwîst e. An na wê rewşa me gelekî xerab be. Ev şer jî bo me minakeke berbiçav e. Ji ber ku em li ser vî riyê nemeşîyan ev tişt hatin serê me. Wê demê nûnerê gelê kurd êşîr bûn. Lê, niha mûxataba li ber

çavan e. Ku te ev mûxataba nepejirand, behskirina aşîyê bi kêrî tu tiştî nayê. Gotinên beredayî ne û xwe xapandin e. Divê em vê yekê bi awayekî vekirî binim zimên.

Hûn di nav endamên avakar ên ÖDP'ê de cih digirin, ÖDP di warê yekîtiya hêzên şoreşger û welatparêz de rola xwe bi cih tîne?

♦ Ez dixwazim minakekê bidim: Ji bo "Trêna Aştiyê ya Musa Anter" piştigiriyê xurt nehate dayin. Lê, di çalakiyên hevbeş de biserketin. Di vî warê de tiştê girîng herdemî û mayîdebûn e.

Tê gotin ku hin kes xwe ji vî karî didin alî. Lê wekî parti helwesta ÖDP xuya ye. Dibe ku dîtinên cuda hebin. Ev tiştekî normal e. Alozi û tevlihevî ji kêmbûna koordînasyonê tê.

Divê em hurmetê nîşanî nirxên xwe yên pîroz bidin. Wekî minak, ji bo min "Şerê rizgariyê" tiştekî pîroz e. Gava ku ez Destana Kuvay-î Millîye ya Nazım Hikmet dixwînim, hestiyar dibim. Hêviya min ew e ku, hevalekî/e kurd jî wekî min hestiyar bibe. Li aliyê din, rewşa Şêx Seîd heye. Ji bo kurdekî Şêx Seîd nîşana mîrxasî û berxwedanê ye. Ji ber vê yekê pîroz e. Ji bo ku dîndar e û aliyê wî yê neteweyî kêr e, divê em rûyê xwe jê nedin alî. Divê em hurmetê nîşanî wî bidin. Lê tekoşîna îro ne wekî berdwama Serhildana Şêx Seîd e. Serhildanên wê demê ji tevgera şoreşger a cihanê veqetiyabûn. Ji ber vê yekê bikin nekin serhildanên bi vî rengî bi ser nakevin. Lê, îro ne wisa ye. Tevgera îro di nav tevgera şoreşger a cihanê de cihekî girîng digire. Vê tevgerê, wekî rêber jî ji xwe re îdeolojiya nûjen a serdema me hîlbijartîye. Divê em vê cudahiye bibînin.

Em dîsa vegerin ser rewşa ÖDP'ê...

♦ Şerê çinayeti wekî her tevgerê di nav tevgera kurd de jî diqewime. Di nav HADEP û ÖDP de şerê baska çepgir û rastgir heye. Ku kî di nav ÖDP'ê de bixwaze xwe ji tevgera kurd dûr bixe, ew kes jî baska rastgir e. Her wiha ku kî di nav HADEP'ê de dijminahiya tirkan bike, ew jî di nav baska rastgir de ye. Ew bask dixwaze bi sisteme re li hev bê.


Di nav tevgerên kurd de cara yekemîn ez di nav PKK'ê de li internasyonalîzmê rast hatim. Me ji destê tevgerên kurd, ên ku aligirîya neteweperestîya kevnare (îlkel milliyetçi) dikin pir kişand. Li gorî fermanên Barzanî dimeşîyan. Barzanî digot: "Ji marksîstan dûr bisekinin." Wê demê em li ser "Mesela Millî" radiwestîyan. Lê yên ku wê demê qaso qala mafên kurdan dikirin, peyva kurd nedînin ser zimanê xwe. Di pane-

lan de digotin: "Hûn li ser mesela etnîk çi difikirin" ku me digot: "Mebest kêşeya kurd e? Bila hevalekî/e ku pirs kiriye, derkeve." Kesî dengê xwe nedikir. Wê demê me, qala têkçûna asimilasyonê, wekhevî, azadî û federasyonê kir. Her wiha me got, digel kurdên li derveyî Tirkîyeyê divê em bi tirkên din re jî têkiliyan deynin.

Bi kurtayî em heya Benda Çînê çûn! Lê, TKP jî di nav de gelek kesan em bi xiyankariyê tawanbar kirin; sal 1967 bû.

Lê, li aliyê din helwesta ÖDP'ê ya li dijî dagirkirina Başûrê Kurdistanê tê rexnekirin. Dîsa tê gotin ku ÖDP di kongreyê xwe de li ser kêşeya kurd zêde nesekiniye?

♦ Belê, helwesta ÖDP di mitînga Sultanahmedê de qels û kêr bû. Lê, bi HADEP'ê re derketina ser kursiyê jî nîşaneya hevgerîyê ye. Jixwe HADEP jî ser meseleyê rawestîya. Her wiha



ÖDP'ê di warê legal de politikayê dimeşîne. Divê mirov rastbîn û bêhnfireh be. Bi dîtinê min ne meseleyêkê dîvdirêj e.

Li ser helwesta kongreyê jî bi bawerîya min, ku îro ÖDP li ser kêşeya kurd programeke berfireh amade bike û derxe pêş ev ne tiştekî rast e. Bila bi awayekî zelal rêgezan (ilke) bîne zimên. Bes e! Di kongreyê de Serokê ÖDP'ê Ufuk Uras jî, meselê bi şeweyekî rast pêşkêş kir. Di kongreyê de Murat Bozlak, ji her

û xatab diyar e'

kesî bêhtir bi coş hate pêşwazîkirin. Ev tiştê girîng e. Wekî diyar e, dewlet partiyên wekî ÖDP rihet nahêle. Lê, nikarin ÖDP'ê bikişînin aliyê xwe.

Dewlet hewl dide xwe ku HADEP'ê ji bikişîne aliyê xwe...

♦♦ Wekî me li jor behs kir. Di nav HADEP'ê de jî têkoşîna çîna yêti didome. Hin destkariyên (mudahale) dewletê yê vîşarî hene. Lê baweriya min ew e ku, wê di nav HADEP'ê de baska pêşverû bi ser bikeve û hêza xwe biparêze.

Birêz Bellî, we di gotareke xwe de diyar kir ku, çepgirên Tirkîyeyê di warê kêseyê kurd de li paş salên 1930'yî mane, çima?

♦♦ Di sala 1930'an de TKP'ê der barê Serhildana Şêx Seîd û Serhildana Agiriyê de ev nîrxandin kir: "Herçiqas serokatî feodal be jî; kesên ku şer dîkin bindest û hejar in. Ev serhildan li dijî çewsandin û

dibêjin neteweperestên kevnare. Ji ber vê yekê em li paş salên 1930'yî man. Derdorên wekî Cumhuriyet û Aydınlık, ji xwe re dibêjin, em şoreşger in. Tu vê yekê ji sola xwe re bêje! ÖDP, SİP û EMEP di wî warî de xwedî helwesteke internasyonal in.

Hûn helwesta PKK'ê ya li hemberî dîn (ol) çawa dinirxînin? Her wiha bi baweriya we, divê tîkiliya sosyalîzmê û dîn çawa be?

♦♦ Bi nêrîna min helwesta PKK'ê ya li hemberî dîn baş û erênî ye. Serdest ji bo berjewendiyên xwe dîn gelekî baş bi kar tînin. Rê li pêşiya kevneperestan (yobaz) vekirin. Pişt re eniya laîkperest û şerîatxwazan dane avakirin. Di vê navberê de marksîst û generalên darbekar li cem hev cih digirin.

Bi bîr û baweriya marksîzmê, dîn ne sedem e, encam e. Dîn berhema tirs û sawê ye. Îro tiştên mirov jê bitirsîn ji berê bêhtir in. Ji ber vê yekê mirov xwe dispêrin dîn. Ev tiştê normal e. Ji ber vê qasê, heya ku mirov ji aliyê çîna yêti ve hişyar nebin, divê mirov li hember vê rewşê bêhnfireh û dilovan be. Marks gotiye: "Dîn ayfon e", lê di vir de biqûdkîtin û şermazarkirin tune. Di wî warî de em ji birjuwaziya radikala cuda ne.

Baş e, gelo mirov nikare hem sosyalîst û hem jî dîndar be? Wekî minak rahîbên Amerîka Latîn...

♦♦ Ji bo rizgariya gel, hîn mirovên dîndar yê ku rêberiya gel kirine, derketine. Di dîroka me de jî mirovên bi vî rengî hene. Ji bo ku êdî dernakevin mirov nikare dev ji wan berde û hêviya xwe jê qut bike. Li wî welatî jî bo ku em bikaribin tiştê bikin divê kesên ku nimêj dîkin û nakin mil bidin hev.

Heya niha, we qala aliyên baş û erênî yê PKK'ê kirin. Baş e, bi boçûna we aliyên PKK'ê yê ku bîr rexne kirin çî ne?

♦♦ Niha ez li ser maseyê rûnim û bibêjim: "PKK ev kir, divê wisa bikira", ev tiştê ecêb e. PKK li ser maseyê nayê rexnekirin. Her kes xeletî û çewtiyan dike. Dema mirov bi hevalên wezîfedar ve li hev rûnişt, mirov rexneyên xwe tîne zîmên. Ji vê pê ve gotinên dîn dibin paşgotin. Hemû kesên ku tîdikîşin û dixebitin xeletiyên dîkin. Lê, divê mirov xeletî û şaşîtiyên ku tîr rast-

kirin, bike.

Medya, li dijî rastiyan propagandayê tînd û qirêj dike. Li hemberî vê propagandayê xwe parastin gelekî dijwar û zehmet e. Li aliyê dîn hin weşanên ku xwe nêzîkî PKK'ê dihesibînin jî çarîna li derveyî xeta serokatîyê dimeşin. Ji an weşanan bêhna neteweperestîyê kevnare difîre.

Wekî hûn jî dizanin nîqas û gotarên li ser pêşverû û paşverûyê artêşê zêde

dibin. Hûn li ser van yekan çî difikirin?

♦♦ Binêrin! Pêşverûyê artêşê ne mimkûn e. Ew sîstemê diparêze û bi destûra împeryalistan darbeyên faşîst li dar dixê. Lê, li aliyê dîn, ev 14 sal in şerek heye. Hin subayên tirk vê yekê dibînin û dizanin ku rewşa Tirkîyeyê ber bi ku ve diçe. Van subayan fêhm kirinê ku ev ne cudakarî ye. Rewşê herî baş ev subay dizanin. Ji ber vê yekê heke tu dixwazî aşîyê pêk bîni, divê tu bi aliyên şer re biki. Di nav meclîsê de kesên xwedî vê cesaretê û niyetê tunene. Ger derkevin, kesên aşîxwaz wê ji nav artêşê derkevin. Di nav artêşê de kesên wekî Bitlis Paşa, Bahtiyar Aydın û Albay Özden digot: "Gelo em li ser rîya rast dimeşin?" Ji ber vê yekê hatin kuştin. Divê mirov artêşê wekî saziyê yekpare nehesibîne. Lê, niha baska şer bêhtir xurt e...

Hûn "Belgeya Siyaseta Neteweyî" çawa dinirxînin?

♦♦ Wekî diyar e, rûmet û prestîja meclîsê ji hemû deman kêmtir e. Artêş, bi vê belgeyê rola meclîsê bi cih tîne û vê valahiyê dadigire. Em nikarin aliyekî tercîh bikin. Li aliyê dîn di belgeyê de qala nasnameya etnîkî dîkin. Ev tiştê balkêş e. Lê divê em xewn û xeyalan nebin.

Em hinekî jî li ser dîrokê biaxivin. We di nivîseke xwe de "Şerê rizgariyê" wekî hêjatiyê rûpela dîroka Tirkîyeyê bi nav kiribû. Lê, gelek kes jî we cuda difikirin?

♦♦ Ne tenê rûpela herî navdar a Tirkîyeyê her wiha ya Kurdistanê ye jî. Divê mirov baş lê bikole. Artêşa fransîyan tevî yekîneyên ermenî yê ku li pey tohildanê bûn, hatibû.


Belê, ermenîyan di dema koçberkirinê de zîlm û zordarî dîtine. Lê, çeteyên ermenî zêdetir li welatê kurdan zîlm û zordarî meşandine. Her du aliyên jî dijîminatiya hev kirine. Bi kurtayî, her tişt jixweber pêk nayê. Wê demê hin mebusên ermenî ku di nav meclîsa Osmanîyan de cih digirtin, gava ku şer dest pê kir, li cem hêzên rûsî cih girtin. Zîlm jiberxwe dernakeve. Tiştê dîn, tevî tirkan, kurdan jî li ermenîyan zîlm û tade kirine.

Dîsa yekîneyên ermenî yê ku tevî artêşa fransî xwestine, ji şûn de vegerin, kurdan ew dane sekinandin. Ma ev ne serkeftin e? Te artêşên împeryalistan tîk birine. Ma "Karayılan" ne mîrxasekî kurdan e? Lê piştî "Şerê rizgariyê" ev rewş nedomiyaye.

Lê, Fikret Başkaya qala talankirina malên ermenî û rûmiyan dike?

♦♦ Bi rastî jî malên talankirin. Lê, ev şer e. Her tişt dibe. Ma kîjan artêşa dagirker destdanîye ser mal û milkan? Li aliyê dîn, xewn û xeyalên "Ermenîstaneke mezin" hebûn. Yekîneyên ermenîyan bi armanca tohildanê hatibûn. Ji ber vê yekê eşîrên kurd piştigirîya M. Kemal nekirin. Ermenîyan li cem împeryalistan cih digirtin.

HEVPEYVÎN: AZAD ALTUN MAZLUM DOĞAN



calan wekî berê bi coş û dilgeş e.


Mirovekî gelekî xebatkar e. Bi şev û roj şoreşê difikire û lê hûr dibe.

Helwesta PKK'ê a li hemberî dîn, erênî ye. Ji bo ku em bikaribin tiştê bikin, divê kesên ku nimêj dîkin û nakin, mil bidin hev.

Hin mudahileyên dewletê li ser HADEP'ê hene, lê ez bawer im di nav HADEP'ê de baska pêşverû yê biser bikeve.

Ji bo aşîyê di nav meclîsê de kesên bi cesaret tunu ne. Kesên aşî xwaz wê ji nav artêşê derkevin.

Hêviya gelan ye kîtiyê xurt e, ku ev yekîtiyê pêk neyê, emê di nav avzêlê de bifetisin.



zordariyê pêk hatine. Çima? Ji bo mafên nasnavî û jiyanê mirovane! Em dikarin rexne li kesên bindest û hejar bigirin û bêjin: "Hûn çima li pey axa û began dimeşin lê wekî Partiya Komûnîst kengê ji gel re qala rastiyan kir ku li te guhdarî nekir."

Bi kurtayî ev serhildan wekî "Şerê gel" tîr binavkirin. Lê, îro hin hêzên qasî çepgir, ji bo tevgerê ku îdeolojiya şîşî a serdema me ji xwe re kiriye rêber,

Di bin erdê de Mîhrîcana helbestan

Digotin

Digotin kitik çelîkên xwe dixwe
min digot qey çîrok e
Digotin çêleka zer deh litir şîr dide
û pişt re lingê xwe lê dixîne
û dirjîne
min digot qey çîrok e

Digotin Nîron agir bi Roma xist
û ji dûr ve lê temaşe kir û kenî
min digot qey çîrok e
Digotin Qabil û Habil ji bo
zeriyekê hevdu kuştin
min digot qey çîrok e

Digotin Beko bi aqilê Mirê Botan
lîst û Zîn û Mem dane kuştin
min digot qey çîrok e
Digotin tirk û faris û ereban dûvên
hespên xwe bi heve girêdane
min digot qey çîrok e

Gotin kurd hevdu dikujin
min got: Ji bo Xwedê... û ji bo dilê min
bêjin çîrok e....

Diya Ciwan

HELÎM YÛSIV

Li bajarê Qamişlo, roja 24'ê
kewçêra 1997'an di seat
11.00'an karê mîhrîcana
pêncan a helbesta kurdî li
Başûrê Biçûk dest pê kir.

Mîhrîcan di jêzemînekê (qeboyekê)
de li dar ket. Hejmara haziran gihişt
pêncî kesî. Têv de nivîskar, rewşenbîr
û helbestvan bûn. Ligel beşdarbûna
malbata Seydayê Cegerxwîn, keça wî
Rojîn û lawê wî Azad yê ku ji Ewropa
hatibû. Ligel çend neviyên Cegerxwîn
û dost û hevalên wî yên ku ew ji nêzik
ve nas dikirin. Wekî helbestvan Mihemed
Eliyê Hisso û Yusif Berazî (Bêbuhar)
yê ku piştî helbesta xwe xwend bi
stranî jî û bi awazeke şîrîn helbest kiribû
stran. Ligel çend navên toreya yên
din wekî Deham Evdîlîfetah û Konê
Reş ên ku danûstandin zengîn kirin.
Tembûrvan û dengbêj Salih Hisên jî bi
awaza Ey Reqîb û bi rawestandina de-
qîqeyekê li ser giyanên şehîdan mîhrî-
canê dest pê kir.

Ferhadê Çelebî pêşkêşvanê jêhatî û
xwediyê keda herî mezin bû di hemû
çalakiyên çandî yên ku li Qamişlo çêdi-
bin de, xêrhatin di mêvanan da û spasi-
ya hatina wan kir. Pişt re rê de nivîskar
Rezo, endamê komîteya rêveberiya
mîhrîcanê û gotina komeleyê hate



xwendin. Gotin bi firehî li ser rola hel-
bestvan di civakê de rawestiya û sê xal
wekî pêşniyar berbiçav kirin:

- 1-Hilbijartina komîteyekê ji bo pê-
kanîn û amadekirina mîhrîcanê
- 2-Hilbijartina komîteyekê ji bo be-
lavkirina xelatan
- 3-Hilbijartina komîteyekê ji bo rê-
veberiya çalakiyên salê ji bo sedsaliya
rojnamegeriya kurdî.

Piştî gotinê, helbestvanê yekemîn
Seydayê Keleş û bi sernavê "Were hel-

re vebû. Li ser pêşniyarên mamoste Re-
zo guftûgo çêbûn. Komîteya rêveberiyê
ya mîhrîcana şeşan a sala bê hate
hilbijartin û komîteya belavkirina xelatan
ji sê kesan hat saz kirin. Xelata mîhrî-
cana pêncan 1997'an dane Melle Nû-
riyê Hesarî. Xelatgirê îsal xwedî ked û
xebateke mezin e di warê ziman û tore-
ya kurdî de. Lê ne ewqasî naskirî ye ji
ber ku piraniya berhemên wî neçapkirî
ne û li gor agahiyên D. Evdîlîfetah xe-
latgir Melle Nûriyê Hesarî niha di rew-
şeke xerab de ye û kalemêrekî nexweş

**Azadê Cegerxwîn: Bi kêfxweşî ez beşdarî mîhrî-
canê bûm. Ez pir kêfxweş bûm bi dîtina dostan û dîtina
gelek xortên nûhatî yên ku bi germayî helbestan
diafirînin. Xuya ye gavine baş hatine avêtin.**

bestê" helbestek xwend.

Bi helbestên xwe; Mihemed Şêxo,
Serhanê Îsa, Şevger, Bêwar Berahîm,
Dildarê Aşti, Arşevê Oskan, Loriyê
Tildarî, Azadê Hemo, Ciwanê Ebdal,
Salihê Heydo, Şîlan Hemo, Evîndarê
Xemgîn, Kasî, Diya Ciwan, Ferhadê
Îçino, Silêmanê Azer, Dildarê Midî,
Mihemed Eliyê Hisso, Royarî Amedî û
Ferhadê Çelebî mîhrîcan geş kirin, bi
helbest, tembûr û stranên xwe jî Yusif
Berazî (Bêbuhar) tevî "Mîhrîcana pêncan
a helbestê kurdî" bû.

Xwendina helbestan di saat yekê
nîvro de qediya û derî ji danûstandinê

û bêkes e û nikaribû bihate mîhrîcanê.
Lê tevî ku xelat bi xwe tiştekî manewî
ye jî, pêwîst e ku em hinekî li sax û zin-
diyên xwe xwedî derkevin. Di dawiyê
de komîteyek jî şeş kesan ji bo birêve-
birina çalakiyên sedsaliya rojnamegeriya
kurdî li Başûrê Biçûk hate hilbijar-
tin.

Gotûbêjek digel lawê Cegerxwîn, Azad

Azadê Cegerxwîn:

Ev bîst û şeş sal in ku ez nehatime
welat. Bi kêfxweşî ez beşdarî mîhrî-
canê bûm. Ez pir kêfxweş bûm bi dîtina

Helbest

Ew helbesta ko bi serê xwe
Li deriyên hesin nexîne
Ko li ber serê birîndaran nelorîne
Ko zarokan ji deh kolanan
li dora xwe necivîne
ku her şev, şevêkê bi min re
şiyar nemîne
wê naçînim ser rûpelan
Bela ronahiyê nebîne
ez wê ji hundur bernadim
Ta ko arê tenûra dil wê bişewitîne.

Min çi divê

Min nexwestiye ku xerita cîhanê
di nava mista destê min de nîgar bikin.
Yan derya hemî xwe di kehnîyokên
çavê min de werkin.
Min neviye ku xaniyê min li ser
kavilên kesê din ava kin.
Tenê divê kes rûyê min

neguherîne

Û xakê ji bin lingên min nekşîne.

Ji xweda pêva

Kesek canê min nestîne

Diya Ciwan

dostan û dîtina gelek xortên nûhatî yên
ku bi germayî helbestan diafirînin. Xu-
ya ye gavine baş hatine avêtin. Eger ev
rewş berdewam bike û bi xebatê wê
gav bi gav tiştekî çandî balkêş di çanda
kurdî de wê li Sûriyê çêbibe û wê bigi-
hê rewşeke xweş ên wekî çandine ge-
lên dinyayê. Em hêvîdar in ku em li ci-
hekî vekirî û li saloneke êşkere beşdarî
çalakiyên bi vî rengî bibin. Çimkî tore
bi xwîna mirov ve girêdayî ye. Tu kes
nikare zimanê hest û xwîna mirov qe-
dexê bike. Bi rastî pir kêfa min hat û ji
bo bîranînê jî ez dibêjim, Cegerxwîn ê
kurdan e. Dema cenazayê bavê min jî
gelê kurd kêmasî nekir û eger hinekan
ji hevalên bavê min digotin di jiyana
me de kes li me xwedî dernediket jî...

Yûsiyê Berazî (Bêbuhar) digot: Ez û
Cegerxwîn carekê li ser rê bi hezarên
metran, li Qamişlo, dimesîyan û me di-
kir nedikir tirimbêlek li me nedisekîni.
Tu kesî rûmet û rêzdarî nedida Seyda û
nade me jî di jiyana me de. Belê tevî wê
jî dibe ku qedera kurdan ev be. Em li
ber vê hezkirina û dana gel, bi navê
malbatê serê xwe bilind dikin û spasiya
tevan dikin ku hiştin cenaze bi wî awa-
yî here serî. Tiştekî xweş e jî ku mala
Cegerxwîn hewşa wî bûye cihê hevdi-
tina rewşenbîr û nivîskar û hunermend
û torevanan. Her wiha jî, bûye cihê ser-
lêdana her kesî. Ez xebata kesên ku vê
rewşê bi pêş de dibin pîroz dikim û beş-
dariya we tevan cihê serbilindahî ye.

Li Navenda Çanda Mezopotamyaê şaxa Stenbolê

● 07.12.1997 Yekşem:

Konsera Koma Azad, saet:17:30

Koma Azad, di sala 1988'an de wekî komeke serbixwe ava bûye. Piştî avakirina NÇM'ê, di sala 1991'ê de xebatên xwe li wir didomînin. Kaseta xwe ya yekemîn, di sala 1993'yan de bi navê 'Şemal' derdixin, piştî vê kasê kom belav dibe. Gava ku NÇM'ya Amedê tê girtin, xebatên xwe li NÇM'ya Stenbolê didomînin. Niha 5 endamên komê hene, û amadehiya kaseta xwe ya duyemîn dikin.

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li şaxa NÇM'ê ya İzmirê

● 06.12.1997 Şemî: Şevên Toreyî, Amadekar: Kovara Jiyanê Rewşen, saet: 18:00

● 07.12.97 Yekşem: Çalakî- "Halk oyunları ve Mızarsen"

● 10.12.1997. Çarşem: Film: Rewşa awarte, derhêner: Costa Gavras Li BEKSAV

● 07.12.1997 Yekşem:

Konferans "Azîneya Ramînê (Düşünme yöntemî)" Cengiz Gündoğdu, saet: 14:00

Agirê Özgür Ülke Tirkiyeyê disoje

"Bombekirina Özgür Ülke û şhadeta Ersin Yıldız di dîroka çapemeniyê de cihe xwe yê dîrokî girt. Li dijî van êrîş û zordariyan jî em dengê xwe nabirin. Emê li pey prensîpên çapemeniya azad bimeşin û rûyê rastîn yê dewletê bidin ber ronahiyê"



"Sê sal berê vê hefteyê roja çarşemê, xwestin dengê muxalifan û gelan rojnameya Özgür Ülke bédeng bi-birin. Di carekê de navenda rojnameyê, teknîk bûroya Stenbolê û nivîsgeha nûnertiya Enqereyê hate bombekirin. Bombeyek bi navê C-4, ku hêza wê ya rûxandinê xurt e, teqîya û xisarên mezîn yên aborî li Stenbol û Enqereyê pêk hatin. Li Stenbolê bi bombeya ku li bûroya teknîkê teqîya, Ersin Yıldız şehîd ket û 23 kes jî birîndar bûn."

Roja çarşemê 3.12.1997'an bombekirina Özgür Ülke, li ber rojnameya Özgür Ülke ku ji aliyê dewletê ve hatibû bombekirin, ji hêla xebatkarên rojnameya Ûlkede Gündemê ve bi beşdariya nêzîkî 100 kesî hate mehkûmkirin. Her wiha xebatkarên rojnameya Ûlkede Gündem li ber kaviîlê Özgür Ülke daxuyaniyek ji bo çapemeniyê xwendin. Ev gotinên jorîn di vê daxuyaniyê de hatin ragihandin. Di vê daxuyaniyê de hate diyarkirin ku, piştî ku rojnameya Özgür Ülke hate bombekirin rojekê bi şûn de bi manşeta "Wê ev agir we jî bişewitîne" (Bu ateş sizi de yakar) derketiye û ew agir

îro hemû Tirkiye disojîne. Dîsa hat bibîrxistin ku Özgür Ülke bi fermana Serokwezîra wê demê Tansu Çiller hatiye bombekirin û di bûyerê de rola Mehmet Ağar jî berbiçav e. Ji bo îspatkirina vê yekê jî gotinên Wezîre Ragihandinê yê Tirkiyeyê Necdet Menzir ên ku ji Mehmet Ağar re gotibûn hatin bi-bîr xistin. Wekî tê zanîn Menzir ji Ağar re li ser bombekirina Özgür Ülke gotibû: "Min ji te re gotibû zîlamên xwe di herêma min de bikar neyîne."

Li aliyê din hat ragihandin ku li Tirkiyeyê serdestiya çeteyan didome û dewlet her çiqas kirinên çeteyan yên kirêt dizane jî, di warê huquqî nikare tu gavan biavêje. Ji ber ku li Tirkiye rêveberiyêke desthilatdar tune ye û dadgeh jî darizandîna çete û îşkencekaran ditirsin.

Daxuyanî bi van gotinên qedîya, "Bombekirina Özgür Ülkeyê û şhadeta Ersin Yıldız di dîroka çapemeniyê de cihe xwe yê dîrokî girt. Li dijî van êrîş û zordariyan jî em dengê xwe nabirin. Emê li pey prensîbên çapemeniya azad bimeşin û rûyê rastîn yê dewletê bidin ber ronahiyê."

AZADIYA WELAT/ STENBOL

TÎŞK

Nûsînî nûserman
nekewtote destî
ême



BEKÎR BAHOZ

Sarya

Bedena xwe bajo,
ser çiyayên azadiyê,
ger dilê te li azadiyê digere.

SARYA SARYA...

Teyrek reqsa azadiyê dike, li çîyan

Dema lal bûn di hepsa îxanetê de ziman,

ew difiriya, difire sibe roja me,
difire pêşeroja me.Bi comerdi xwîna xwe diniquîne
û evînê mezintir dike di dilê me de

Bedena ku xwe neşûştibe, bi şer,
û dilê xwe pak nekiribe bi agir,
wê xwediyê zîmanekî lal be her dem,

teyrê reqsa xwe neajo bandeva çîyan..

diqire bi reqsa xwe Sarya li bandevên

çîyan

reqseke mezin û qet danayê.

Teyra ji êgir

Sarya li ZAP'ê gihîşt dansa xwe.

Sarya, rista xwe ji ser dikên şanoyê, gihîşt serê çîyan.

Ew lal bû di reqsê de,
lê di jîyanê de, li serê çîyan bû şervaneke azadiyê!

Her mirinek bû rîyeke azadiyê li pêşîya me.

Wekî Elî Temel, wekî Melek, wekî Hêlîn.

Emê ramanên nûjen li xwe bipêçin, dengê xwe bilintir bikin,

reqsa xwe mezintir bikin, û bêrawestî û bêrawestî,

emê bimeşin, ber bi armanca xwe ve,

emê bimeşin,

bi înad..!



Nursel İnce
(Sarya)

Navenda Çanda Mezopotamya

Mencola qîza Yaz Begê (1)

Di dema berê ya mîr û began de li Kurdistanê her herêmek girêdayî mîrekî bûye. Di wê demê de Mîrê Sîpanê Xelatê navê wî Yaz Beg bûye. Mîrê Kela Wanê jî Ûsif Beg bûye. Her beg berpirsê herêma xwe bû. Ji bo têkiliyên navbera wan, li gorî demê, mirtibê wan (derwêş) hebûne. Navê mirtibê Ûsif Begê Xişo bûye.

Ûsif Begê mîrê Kela Wanê, sê jinê wî hebûne. Şevkê di xewna xwe de Mencola qîza Yaz Begê dibîne û dibe evîndarê wê. Sibê zû radibe, bangî Xişo ye mirtibê xwe dike, tîne dîwanê, jê re wiha dibêje:

*Ûsif Beg mîrekî Kela Wanê ye
Rûniştîye li ser kevîrê bînektaşê ye,
Dixwaze gustîla Mencola Yaz Begê*

*Serê çiyayê Sîpanê ye
Sîba du sibeyê, sîba du sibeyê
Taveke baranê têye tevî bê ye
Vê sibê dilê min menc bûye
Mîna bihara Wanê*

*Kuro Xişo tu were ji min re lêxe saz û kementçê ye
Belkî dilê min were ser qerara berê ye
Xişo, Ji Mîr re, lêdixe saz û kementçê,
dilê mîr tîne ser qerara berê ye.*

Mîr:
Kuro Xişo tu here ji min re bîne gustîla Mencola Yaz Begê, ezê te tîr bikim bi malê dinê ye.

Xişo:
*Mîrê min, mîrê min, mîrê min...
Sîba du sibê ye, sîba du sibê ye
Taveke baranê têye tevî bê ye
Tu bidî min mehîna Delîhorê ye
Tu bide min destek kincê axatîyê ye
Tu li min bike kurk û ebyayê maqûliyê ye
Tu çend zêran bide min, ez ji zar û zêçên xwe re bikim îdara salê ye
Ezê herim bînim, gustîla Mencola Yaz Begê ye*

Ûsif Begê mîrê Kela Wanê, emir dide xulamê xwe, dibêje:

*Bidî Xişo mehîna Delîhorê ye
Li Xişo bikin destek kincên axatîyê ye
Bidî Xişo kurk û ebyayê maqûliyê ye
Çend zêra ji bidîna bila Xişo ji zar û zêçên xwe re bike îdara salê ye*

Xulam dema xwestinê Xişo bi cih tînin, bi emrê Ûsif Begê, tiştê ku Xişo dixwaze ji Xişo re amade dikin. Xişo hazirîya xwe temam dike, li mehîna Delîhorê siwar dibe, berê xwe dide serê Çiyayê Sîpanê. Bila ew bi rîya xwe de bimeşe, em werin ser mesela Yaz Begê mîrê Çiyayê Sîpanê Xelatê.

Sibe ye; Yaz Begê, rûspî, bi xulamên xwe ve derketiye deşt û seyde. Bala xwe dayê ku siwarekî ji wê de tê. Hatina wî siwarî hatina axatîyê ye. Kurk û ebyayê wî kurk û ebyayê maqûliyê ye. Lê bala xwe dayê, serê saz û kementçê derketiye bin ebyayê. Nêzîk bû, bala xwe dayê ku ew Xişoyê mirtibê Ûsif Begê mîrê Kela Wanê ye. Xulam û xizmetkar çûn pêşiyê, anîn hizûra Yaz Begê ye.

Yaz Begê jî pirsî:

– Xişo li te xêr e serê vê sibê.

Xişo got:

Mîrê min, ez çî ji te veşêrim, çî ji Xwedê. Ûsif Begê mîrê Kela Wanê, serê vê payizê li zar û zêçên min hatiye xezabê. Ez hatime cem hazirên bînanî (mîna) te, çend zêra bide min ez dê herim ji zar û zêçên xwe re bikim îdara salê.

Piştî wê gotinê, Yaz Begê dibêje:

– Lawê min Xişo, kerem bike em herin aliyê dîwanê.

Ji Xişo re kirin îkrama çayê û qehwê. Yaz Begê got:

Xişo ka tu rabe demekê ji me re lêxe saz û kementçeyê

Xişo dest avête sazê û kementçê. Kul li mala bavê Xişo bikeve. Dengê Xişo wisa ye mîna dengê qulingê biharê. Dengê Xişo diçe aliyê Mencola Yaz Begê.

Mencol dibêje:

– Gelî xidaman ev deng dengê kê ye?

Xidam dibêjin:

– Xanima min ev deng dengê Xişo ye mirtibê Ûsif Begê ye. Ûsif Beg li zar û zêçên wî hatiye xezabê, ew jî hatiye cem bavê te ku çend zêran bibe ji bo zar û zêçên xwe ku bike îdara salê.

Mencol radibe xulamêkî dişîne cem



bavê xwe, dibêje bila demekê Xişo bişîne aliyê oda min zeriye, bila demekê ji min re jî lêxe saz û kementçê. Xulam gotin û xwestina Mencolê ji Yaz Begê re dibêjin. Yaz Beg emirê dide Xişo, dibêje:

– Kerem bike here aliyê oda Mencolê, demekê jî keça min re lêxe saz û kementçê.

Xişo radibe berê xwe dide aliyê oda Mencolê. Mencol jê re çay û qehwê îkrâm dike. Xişo bi dilekî şewat destê xwe davêje kementçê. Kul bi mala bavê Xişo bikeve, dengê Xişo wisa ye, mîna dengê qulingê biharê.

Xişo:

Sîba du sibe ye, sîba du sibe ye...

Taveke baranê tê û tevî bê ye

Xanima min, bejna te zirav e

Mîna taka rihanê ye

Fistanê te mîna belgê gulê ye

Taxima sing û berê te mîna

Kaxeta Semerqendê

Qelem xwe bi xwe ser de diçe û tê ye

Mîna sicadekî meriv

Bavêje Camiya Stenbolê

Sedriazam ser de bike du rîket limêja sibê ye

Ew ne layiqî kesî ye

Ew layiqî Ûsif Begê Mîrê Kela Wanê ye.

Ku Xişo wiha dibêje, wê demê bendê piştî Mencolê sist dibin. Mencolê got: – Kuro Xişo, eger tu min layiq dibînî ji bo Ûsif Begê mîrê Kela Wanê, ha ji te re gustîla min, bibe bide Ûsif Begê mîrê Kela Wanê. Çend heb zêran jî didê Xişo, dibêje:

– Bibe here ji xwe re bike îdara salê.

Xişo dibêje:

– Xanima min ez çî ji te veşêrim çî ji xwedê. Jixwe ez hatibûm gustîla te bibim ji bo Ûsif Begê mîrê Kela Wanê. Mencol dibêje:

– Xişo ez soz didim ez tucar nadim izna dawetê. Piştî Ûsif Begê bila mîr li min heram bibe ser rûyê dinê.

Xişo gustîla Mencolê hildide, xatir ji Mencolê dixwaze. Li mehîna Delîhorê siwar dibe, berê xwe dide Kela Wanê. Sîba du sibê, sîba du sibê, her sê jinê Ûsif Begê derketine devê dîwanê, bala xwe danê, Xişo wê de tê, jina Ûsif Begê ya mezin çû pêşiyê, gote:

– Xişo ez ketime ber bextê te û ye xwedê! Ez dizanim te aniye gustîla Mencola Yaz Begê, ku tu gustîlê bidî min ezê te tîr bikim bi malê dinê.

Jêderka olan Mezopotamya

Mirovahî li ser erdnîgariya Mezopotamyayê derket holê, şax veda û bi pêş ket. Li ser vê erdnîgariyê gelek şaristanî jiyîn. Bi jiyana û bîr û baweriyên xwe li ser gelên peyrewên xwe bandoreke mezin çêkirin. Piraniya wan gelan ji ber hin sedeman di kûrahiya dîrokê da winda bûn. Hinek ji wan jî li hemberî qirkirin û pişafînê têkoşîneke dijwar dane û heta vê rojê hebûna xwe parastine. Bêguman di van têkoşînan de her çiqas rêxistinbûneke leşkerî û deshilatdariyeke siyasî ya xurt jî cihekî girîng girtibe jî, bîr û baweriyên olî jî di van têkoşînan de hêmaneke girîngin. Bîr û bawerî hem di destê dagirkeran de (ji bo pişafînê) û hem jî di destê binecihên vê erdnîgariyê de (ji bo berxwedana li dijî pişafînê), wekî çeka herî bikêr hatiye bikaranîn.

Gelê kurd yek ji wan gelên ku herî kevn ê binecihê vê erdnîgariyê ye. Di warê bîr û baweriyên olî de di gelek qonaxan re derbas bûye û heta vê rojê hatiye. Ji bo ronîkirina dîroka gelê kurd, ev mijara olî divê bi awayekî zanistî bê zêlalkirin. Ji ber ku çarenûsa wî gelî û guhartina rewşa wî ya şerperze, hinek jî bi vê mijarê ve girêdayî ye.

Musa Şanak û komek hevalên wî li ser vê mijarê pirtûkeke lêgerîn û lêkolînê ya bi navê "Li Mezopotamyayê derketin û Bipêşketina Olan (Mezopotamya'da Dinlerin Doğuşu ve Gelişimi)" nivîsîne. Pirtûka ku ji 470 rûpelan pêk tê, ji layê Weşanxaneya Aram ve, ku beriya demeke kurt hatibû vekirin ve hatiye çapkirin û yekemîn pirtûka vê

weşanxane ye. Her çiqas pirtûk li ser navê Musa Şanak (ku demekî dirêj e ji doza PKK'ê hatiye girtin) hatiye çap kirin jî ev xebateke kolektîf e. Pirtûk bi giştî ji heşt beşan pêk hatiye.

Di destpêka beşa yekemîn de li ser dîroka xurtbûna bawerî û manewiyeta jiyana mirovahiyê û sedemên derketina baweriyên olî tê rawestîn. Bîr û baweriyên olî (Vayu, Zervan, Mîtra, Mazdaîzm, Dayava Yasna) yên ku beriya ola Zerdestî û ev baweriyên hanê ku bingeha Zerdestiyê pêk anîne, tên ravekirin. Dû re li ser mijarên wekî di ola Zerdestî de pergala bîr û baweriyê, rê û rêçikên perestîne, jiyana aborî û civakî, cihê pîrekê û hwd. bi awayekî berfireh li ser hatiye rawestîn.

Beşa duyemîn û çaremîn jî mijara mezheban re hatiye veqetandin. Di vê beşê de nivîskar bi şîrovekirina tîgiha

mezheban dest pê dike û sedemên derketina wan û dîroka mezheban merhele bi merhele rave dike. Derketina mezhebên ola mûsewî, îsewî û îslamî dide daxuyandin û ji heyama xalîfetiye Emevî, Abbasiyan û heta heyama nû ya îro bi taymendiyên wan ên bingehîn tên ravekirin.

Her çiqas li ser mezhebên olên din bê sekinîn jî, bi piranî li ser mezheb û tarîkatên îslamî hatiye rawestîn. Ji ber ku ev mezheb û tarîkatên olî ên îslamî jî ser çarenûsa gelê kurd bandoreke mezin çêkirine. Desthilatda-

ran ji bo parçekirina gelê kurd ev cudatîyên olî kirine bingeha nakokiyê û gelê kurd ji hev re kirine dijmin. Ev rewş îro jî berdewam e û li hemberî Têvgera azadiyê kelemek pir mezin e. Nivîskar jî bi piranî li ser dek û dolabên dewletê radiweste û tesbîten balkêş dike. Pişt re

jî dide zanîn ku çawa bi taybetî gelê kurd di bin banê van tarîqatan de bi dîrektîfên dijmin çawa tene asîmîlekirin û sistem bi vî awayî li ser piyan dimîne.

Di beşa sêyemîn a pirtûkê de li ser rewşa Kurdistanê ya beriya îslamiyetê û piştî derketina îslamiyetê hatiye sekinîn. Di beşa pencemîn de mijara sereke ola Êzdayî ye. Nivîskar li ser bîrdoz û Êzdayiyê, pirtûkên pîroz ên Êzdayiyê, Êzdayî û felsefe û bûyerên ji sed sala 7'an û heta îro rewşa Kurdistanê, ji çavkaniyên cur bi cur ve minakan dide.

Beşa şeşemîn de listikên Komara Tirk a li ser alewîtiyê, beşa heftemîn jî li ser bektasîtiyê ye. Bi mijarên mîna Osmanî û alewîti, M. Kemal û alewîti, CHP û alewîti, 12 rezberê û alewîti û rola Bektasîtiyê a di jenosîda Spî de baş tê ravekirin. Beşa heştamîn ol û mezhebên li Mezopotamya û Kurdistanê û nêzîktêdayîna wan bîr û baweriyên a li hemberî jinan dide xuyandin.


Di amadekirina pirtûkê de ji çavkaniyên gelek berfireh sûd hatiye wergirtin û vê yekê jî xebateke bêhtir zanistî derxistiye holê. Digel hin kêmasî û xeletiyên tashîh û mîzanpajê ve jî ji bo fêmkirina mijarên bîr û baweriyên olî û listikên dagirkeran ev pirtûk çavkaniyeke baş e.

Aram BasınYayuncılık
İstiklal cad. Terkos Çıkmazı sokak,
Karaaslan apt. Kat: 1 D: 104
Beyoğlu/ İstanbul

SERWISA ÇANDÊ

Hejmartina gelemperî û nîjadperestî

CELALETTİN YÖYLER



Di şa di hejmartina nîfûsê ya gelemperî de, bandora nîjadperestîya heştê salî, xwe derxiste holê û nîşanî mirovahiyê da. Her wiha nîşanî cur bi cur neteweyî gelên di bindestê vê dewletê de da. Mirov dibêje qey hê jî nîjadperest guman dikin ku ewê bi helwesta xwe ya nîjadî, bidin xuyakirin ku di nav sînorên vê dewletê de, ji bilî nîjadê turanî tu neteweyî gel-najîn.

Lê bi rastî ev ji bilî xwe, êdî nikarin tu kesî bixapînin. Lewra ereb dibêjin: "Heyhat û heyhat" yanî li ku û li ku, hûnê çawa gelê kurd bixapînin, we demekê beriya niha got: "Me kurd kuştine, tune kirine, xistine gorê û ser wan jî beton kiriye." Lê em û her kesê li ser rûyê cihanê dibînin, ku gelê kurd, ew gor qelaştin û jê derketin. Hê jî kefenê xwe, yê wê mirin û koletiya bi sed salan çirandin

û bi kîn û nîfrîna mîrata xwe ya bi hindikî heft hezar salî, serî hildan û gotin: "Hey nîjadperestên bêwîcdan, em êdî pir bi hêz û xwenas in, me kefenê xwe çirand. Em xwedanê mîrata (mîras) a heft-hezar sal berê ne, hûn çima me înkâr dikin û tune dihejmêrin? Beîrî bûna Îsa pêxember bi du hezar salî em "Med" bûn, di dema Nemrûd û akirê Îbrahîm de, em li wir bûn. Li Rihayê li Heranê bûn, di 585 sal berî bûyîna Îsa de em Qiyaqsar û kûrê wî yê Îstiyac (Kewkawîs) û Rustemê kurê Zal (Erbaxos) bi xwe bûn. Em dîsa "Daryosê mezin, Serok Dadayê Madî bûn. Me li ser axa Mezopotamyayê bi Îskenderê meqdûmîre ceng kiriye, em Buxtunesir (Goderz) ê Medî ne, me ji bo Yehya pêxîmber û bavê wî Zekerya pêxîmber di ser leşkeriya Nebûzazan Mîrê bajarê Elkê (Beytulşebabê) de bi fermana Serok Goderz bi cihûyan re li bajarê Qûdsê şer kir.

Niha jî em li ser wê axê ne, ew ax û ew welat bêxwedî nîn e û nemaye ku hûn me gelê kurd tune bihejmêrin û bibîne xudanê ax û welatê me. Di van demên dîrokî de em li ser vê axê bûn, niha jî em li vir in, gelo hûn di wan demên dîrokî de li ku bûn? Niha jî xwe xudanê axa Mezopotamyayê

didine nîşan û gelê kurd bi derewan tirk didine xuyakirinê.

Gelo rejîm a nîjadperest bi vê helwesta xwe ya ne mirovî dixwaze çi bike? Dîsa gelo ev 80 salan bi nîjadperestîya çepel, çiqas doza xwe ya bi mebesta tune kirin û windakirina gelê kurd çiqas pêş ve birin? Kurd ji bav û kalên wan, cih û warê wan Mezopotamya ye, hûn dikarin wî gelî bidine dîrxistin û windakirinê? Na, nikarin tu tiştekî di vî warî de bi dest bixin, ji bilî xwîn-rijandin, mal-şewitandin û perîşankirina herkesê di vî welatî de, nemaze perîşankirin û xwîn-rijandin û reşekuştinê bi çepelî û ne mirovahî û barbarî.

Lê gelê kurd digel van bîdadiyên ku li wî tê kirinê jî, hê pirtir li doza xwe ya gelêrî û neteweyî xwedî derdikeve û hişyarbûna pale û karkerên gelan û hişyarbûna gelên din zêde dibe. Divê rejîm dest ji hovîti û nîjadperestîya xwe berde û biratiya gelan bipejirîne û demokrasî û mafê mirovan bi cih bîne. Hem jî dest ji vê helwesta xwe ya nîjadî berde û bêje: ev erdnîgarî warê renga reng gelan e. Wê demê her kes, xudanên mafan, her kes wekhev, di her warî de bi serbestî beşer û bîxwîn dikare bijî.

Qelema min ji dara ter e

Merheba ji we re gelî mêvanên, bi-borin xwendevanên hêja. Ez ji we tika dikim ku hûn, giliyên min di rêveberiya Azadiya Welat de nekin ji ber xeletiya li jorê, lewre jixwe li maniyên digerin ku şûrê min (dîsa biborin), pêûsa min desteser bikin, pişt re jî binbir bikin. Rêveberên rojnameyê dibêjin vê zivistanê hewcedariya me bi daran heye, ji pêûsa Qelemşûr stûrtir dar bi dest nakevin, lewre jî dixwazin koka wê darê biqelînin.

Min xwe bi darê zorê ji destê wan rihakir, min got herin Gündemê pêûsa, **dr. martinez** desteser bikin, pêûsa wî ji ya min stûrtir e. Jixwe gira min li hemberî wî heye. Lewre Serkaniya Giştî ya tirk ew vexwend gera rojnamegeran, lê ez dawet nekirim.

Ji ber ku ez beşdarî gera leşkeran nebûm, a rast gazî min nekirin, ez li ber televîzyonê rûniştim û min dest bi zappingê kir. Ji nişka ve wekî ku mirov tûşî afatek ji afa-tên ku tê serê kompûteran bê, min dît li her derê rojnamegeneralên ku beşdarî gerê bûne, derdikevin pêşberî min. Min got ka Xwedê li wan hatiye xezabê, ez bi lez li hemû kanalan geriyam. Tê zanîn ku Xwedê li bendiyên xwe yê dilovan tê rehmetê, (dema min qala rehmetê kir, bila baran neyê bîra we), min dît "Pencereya Yasemînê" derket. Li wê derê generalekî rastegîn Kenan Evren hebû. Tiştê xerîb ew bû ku bernamê li hemamê hatibû kişandin, lewre pencereya ne ya Yasemînê, lê ya he-



mamê bû. Dîsa jî, ji ber bêgaviya min çavên xwe ji vê bêbaviyê re girtin.

Di bernamêyê de gazî naskiriyên Evren dikirin. Di paceya hemamê de be jî Yasemînê bernamêyêke zor çak amade kiribû. Pêşî gazî ruhê Esat Oktay Yıldırım kirin, dema wî Yıldırım li hemberî xwe dît, çavên wî tîjî hêstir bûn, hev û din hambêz kirin. Yıldırım giliyên Apociyan di Evren de kirin, got ew li wê derê jî rehetiyê nadin min, hemû miriyên kurd rakirine ser piyan, serhildanan çêdikin.

Piştî ku Yıldırım çû, îcar gazî yekî zindî kirin, ew jî celadê pênçî kesên ku hatibûn daleqandin bû. Dema Evren celad li hemberî xwe dît, zaf tirsîya, rabû ku bireve, lê piyê wî şemîti ket, Yasemîn ket bin milê wî, ew rakir li ser kevîrê sor da rûniştandin. Celad destê wî maçî kir ji wir ve-

qetiya. Îcar gazî hembîşeyên wî kirin, lê hinekan ji wan li ser pêşniyaza xebatkarekî Azadiya Welat, wênayê sêpiyekê diyarî wî kir, li ser vê yekê gelek zivêr bû, firçeyay xwe tûj kir û ajot ser hembîşeyê xwe.

Li dûv vê rûdana diltezîn, îcar gazî Emel Sayînê kirin. Dema galegaleke bêsincî dest pê kir, min dev jê berda. Lewre dema rêveberên rojnameyê ez li hemberî vê bernamêyê bidîtama, ewletiya kar û canê min nedima.

Xwendevanên hêja, ez ketime bextê we ku hûn giliya min nekin. Min nezaniyek kir, li min biborin. Jixwe min bi zorê pêûsa xwe ji destê wan derxistiye. Ezê bê pêûs çawa binûsim? Heta ez bêm naskirin, nav û dengê min zêdetir belav bibê, divê hûn li min xwedî derkevin. Ji bo ku ez zûtir navdar bibim, êdî ez wekî berê paş-

navê xwe jî naguherim.

Ji min re paşnavêk divê, lê zêde wexta min nîn e ku ez li ser bifikirim. Ji ber mercên em tê de divê ez destê xwe bi lez bigirim, nexwe çavên gelek li cihê min e, dema di Independentê de jî cih ji xwe re nebînin, êdî wê werin wekî çawa ku hêzên dewletê rojnameyên dijber desteser dikin, destê we ji weşanên we dikin, ewê jî werin cihê min desteser bikin û destê min jî vî quncikê xweşik bikin. Ji ber vê egerê ez paşnavê xwe dafînim, "Qelemşûr Jênager".

Li ser vê bûyera girîng û mezin min ji we re kurtristeyek amade kiriye, ji bo ku hûn min efû bikin, giliya min nekin.

*Qelemşûr im,
Jênager im
Wekî şoyê me
Di neyarê xwe digirim
Min ne bask û ne jî per im
Rêveberên Azadiya Welat
Ez ji ber bi ku de herim
Şer şer e
Pêûsa qelemşûr ter e
Biçe ku dê li min vegere
Qelemşûr rojnameger e
Li pey gotina xwe dihere
Ne xwediyê zimanê lal
Çavên kor û guhên ker e
Wekî zêrê zer e.*

QELÊMŞÛR JÊNAGER

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (97)

XAÇEPIRSA

K	D	K	E	S	E	R	H	A	T
V	A	D	A	N	A	N	E		
A	S	K	E	L	P	S	R		
P	E	H	N	S	I	T	A		
F	E	T	D	A	K	K	U	L	
R	I	B	A	B	D				
E	N	M	I	N	A				
S	A	D	E	W					
I	T	A	L	I					

PEYVA VEŞARÎ

Bersiva Xaçepirsa 95'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesên belav bikin. Xelata hejmara me ya 97'an pirtûka Musa Şanak, "Mezopotamya'da dinlerin doğuşu ve gelişimi" ye.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva-veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 95'an pirtûka Berhim Paşa "Gaziya min" qezenc kirine: Ferit Şahin/Êlih, Berivan Altınışık/Êlih, Murat Yayırtan/Mêrdîn, Tahir Güler/Semsûr, Namet Eripêk/Stenbol

Navçeya Colemêrgê Parlament era Kurd	Bêdengên gelêrî Güney	Eşîreke kurdan Tîpa serî ya 'av'	Kurtasiya anîha Baneşana telefonê	Tipeke kurdî Musa	6	Miraxtur
			2		Tipeke kurdî Tûmek dar	
Derew		Dengveda				
Bi tirkî ba		Rêxistnek navnetewî Kurtenivîsa 'tez'		Ne hişk Tipek		
Bêdengên rûmet Tipeke kurdî	9	Azot Kesê ji eşîra Raman	Qerax Dijî dan	1		
4	Kemasî Paytexta İtalyayê	3	Herêmeke li Stenbolê	Hîriya badayî Qeda		
Bêdengên rez Tav		Neteweyek Tîpa yekemîn		5		
	Hazir Rojek	10				
Notayek Rûniştêk		Çêkrin		8		
		7	Berepaşki anî			

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10

ŞÊNÎ HATIN HEJMARTIN



Nêweşê zîndanan û Leyla Zana

Nê embazî nêviraday, tedawiyê ci jî nêkerd û nê embazî zîndan de nêweşîn ra mardî. Ek nê viradayê û tedawiyê ci virazyayê, nê embazî nêmardê. Ancî ewro her zîndanî de, new des nêweşî estê, ek tedawiyê nînan mevraziya ewro meşt, nê embazê jî bîmrê.

Dewleta tirk reaksiyonan ser, wazena zey Eşber Yağmurdereli mebûsa Partiya Demokrasi (DEP) Leyla Zana virado, La belê, Leyla Zana wa jî, zey Eşber Yağmurdereli viradayin qabûl nêkena û vana ke, azadiyî qandê (serba) xo nê, qandê şarê kurd wazena.

Hefte wo verîn serokwezîrê tirk Mesut Yılmazî verdê geyrayînê welatanê jûwîna Ewropa û Amerika-jew eşkerakerdî de vat: "Ma dê qandê nêweşînda Leyla Zana, raya cezay taloqkerdina viradim." Nê vatenanê Mesut Yılmazî pey ra mebûsa DEP Leyla Zana l'ê meng de ey rê mektûb rîşt (rûsnê-erşawit) û mektûb de vînayînê xo wino ardê ziwan: "Wexto ke, ez û embazê mi meclîs ra çêbiyay, to çepikî cenay û to jî qandê meclîs-ra-çekardîne (eyştîne) ma, ray eyştî û şîma ez û embazê min eyştî zîndan. Ewro jî, ti vejyayê qandê Jûwîna Ewropa, Amerika û reaksiyonan, wazenê raya cezay taloqkerdina, mi viradê."

Leyla Zana mektûb de, dawo zanayîn ke, êkê wextê meclîs ra çêbiyayîn Mesut Yılmazî kerdî, ê çewtîbî ê û êkê oyo wazeno ewro bikro, ê jî çewtî ê. Zana wina vat: "Tewayînê ke, ewro şarê kurd û tirkê ancenê, ezo wazena nê tewayînê (acılar) biqedyê û şero lîminî (qilêrîno) ke ewro ramano, o jî raya siyasî û demokrasiya çareser bibo." Goreyê vatena Zana hetanî şarê kurd azad nêbo, a jî azad nêbena. Coka awa jew (yew, jû) xo nê, qandê şarê kurd û şaranê bindestan azadiyî wazena. Coka jî Zana wa, raya cezay taloqkerdina viradayîn red kena.

Leyla Zana nezdiyê na mektûb, jû jî Serokê Amerika Bill Clintonî rê rîşt. Zana na mektûb de jî, vînayînê ke ma cor de nûştî

nezdiyê înan ardê ziwan û wina vato: "Şero ke mabendê PKK û dewleta tirk de ramano 14 serî, xo peyd ternay û nê şerê lîminî (qilêrîno) de zaf goniya şarê kurd û tirk rijyê û hewna jî awa rijyena. Tirkiye de niyê benê, Ewropa û Amerika de jî qandê azadiyanda mi, kampanyayê dest pê kenê û nê kampanyayê jî jew namedê mi na virazyenê û yenê ziwan. Goreyê vatenan şîma dê, Mesut Yılmazî qebûl kerdînde, azadiyina mi biyarê ziwan.

Ezo jew qandê xo nê, qandê şardê xo azadiyî wazena û qandê şardê xo zîndan de rakewna." Mebûsa DEP mektûb de, dawo zanayîn ke; dewletê superê nê kerdên û kampanyayan qandê merdimatî û aşî (bêguman êkê nê kampanyayan danê dest pê kerdî nînan miyan de, êkê qandê merdimatî kenê jî estê) nê, qandê karandê xo kenê nê kerdên û virastênê jî, qesasan (sorunlar) û şeranê lîminan nêqedînenê, verînan ra diha benê xorî û vêşî. Xorî û vêşîbiyayîna piya bêçim racenayîn û xepynayîn tewayî nêbenê."

Zek yeno zanayîn, nê kayê çimracenayîn û xepynayînê newe nêbenê. Ma, nê kay verî jî çend finî dî. Işık Yurtçu de, Eşber Yağmurdereli de û zewbî. Nê kerdên û virastî zey vatena Leyla Zana qandê çimracenayîn û xepynayîn virazyenê Ek winî nêbiyayê Yunus Yaman, Polat Yiğit û Salih Çelikpençe jî, viradyayê. Nê embazî nêviraday, tedawiyê ci jî nêkerd û nê embazî zîndan de nêweşîn ra mardî. Ek nê embazî viradayê û tedawiyê ci virazyayê, nê embazî nêmardê. Ancî ewro hema hema her zîndanî de, new des nêweşî estê, ek tedawiyê



Mebûsa Kurdî Leyla Zana nêweşînda zîndanîna Ewropa de rakewna

nînan mevraziya ewro meşt, nê embazê jî bîmrê. Ezo wazena tiya çend nimûney bidî. Osman Daş, Salih Gündoğdu û Nîmet Can nê embazî ewro zaf nêweşî û dewleta tirk nêviradana tedawiyê nê embazan virazyo. Yanê sermayenê dewletê, nê embazan û ê bînan nêvînenê, êkê namdarê û silasnayeyê, reaksiyonan ser înan vînenê û viradenê û wazenê nînan çimanê şarî racenê û şarîyê dewletê rastîn û lîminî mevîno. Ek dewleta nêwazena nêweşî zîndanan de rakewê, wa hema destê xo to kiro û hemû nêweşan virado. Taybetî jî nêweşanê giranan. Işık Yurtçu, Eşber Yağmurdereli û Leyla Zana tenya viradayîna kes nêxapeyniyeno.

MEMED DREWŞ

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayınçılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNİŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX:
(0 212) 251 90 13

Gerîndeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê têkiliyên bi gel re
(Halkla ilişkiler müdürü)
METİN AKSOY

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.
BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:
(Nünerê Giştî yê
Ewropayê)

Mahmut Gergerli
49 871 67 08 15

Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsv

Berlin:
Silêman Sîdo
00 49 30 691 6495

Hannover:
Selim Biçûk
49 572 18 13 60

Stockholm:
Robîn Rewşen
46 87 51 05 64

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Hollanda:
S. A. Fewzi
31 104 85 55 43

Redkarê Wîcdanî Osman Murat Ülke: Em ji bo ku bidarizînin diçin dadgehê

Jixwe îro li Tirkîyeyê bêhtirî sê sed hezar firarên leşkeriyê hene. Her çiqas hejmara "Redkarên Wîcdanî" kêm be jî, hebûna wan dike ku ev hejmar zêde bibe û gumanan bixe mêjiyê xortan da ku bizanibin neçûna leşkeriyê jî li ber wan riyek e.

Wisa xuya ye ku, têkoşîna li dijî çûna leşkeriyê û dijberiya şer wê gelek dûvedirêj bikişîne. Gelo li gorî we, wê ev têkoşîn bigihêje encameke çawa; mebest çi ne, pîvanên hiqûqî û ehlaqî di vê merhaleyê de divê çi bin?

■ Vê gavê di warê hiqûqî de aloziyek li holê heye. Lewre jî bi serketina vê têkoşîna ku li ser milê kesan dimeşe, wê çiqas wext bistîne, di vê riyê de wê çiqas ji temenê me di qîşleyan de û çiqas jî di girtîgehan de derbas bibe, ne kifş û diyar e. Bi têkoşîna li dijî leşkeriyê, armanca me ne çareserkirina ku bibe sedema guherîna zagonan e. Jixwe ev yek di demeke kurt de ne gengaz e. Bi vî şeweyî armanca rastîn û watedar, bi rexne û tawanbariyê riya nîqaşan vekirin û derxistina artêşê ji dirûvê saziyêke pîroz e. Nîqaşêke bi vî rengî; rêxistinên cur bi cur, raştiya şer, tîkiliya di navbera şexs û dewletê de û pîrgirêka demokratîkbûnê di nav xwe de dihevin. Ji nîqaşê re vekirina mîlîtarîzmê, bi têkoşîna çalak, rêxistî û dûrî şidetê, wê rê li ber çanda berxwedaneke nû veke. Heger kevneşopî berxwedaneke desantral (ne-navendî) bê afirandîna wê gavê têkoşîna "Redkariya Wîcdanî" wê bigihêje armanca xwe.

T u
d o -
z ên

xwe bi rêk û pêk û bi îsrar dişopî-nî..çima?

■ Bêguman em dadgehan meşrû nabînin, nexwasim "dadgehên leşkerî!" Ji ber ku dadgehên leşkerî îro ji DGM (Dadgeha Ewlekariya Dewletê) yan bêhtir saziyên taybet in ku bi bîrdoza kemalist ve girêdayî ne. Lê her gav em dibêjin; taybetmendiyeke me ev e ku em ji aliyê bîr û ramanên xwe ve zelal in. Em bi tenê dikarin bi vê taybetmendiya xwe ji nîrxên ferdî derbasî nîrxên giştî û ehlaqî bibin. Bêguman ji bo hebûna xwe, ji bo bîr-xistina dewletê çûna leşkeriyê, qîşleyê û dewletê paradoks e. Lê carinan jî ev yek watedar e. Dema rewş wiha be, divê ez biçim dadgehê ku xwe bi hemû rastiyên xwe îfade bikim. Bi awayekî din ku em bibêjin; ne ji bo ku em bêne darizandin, lê ji bo ku em wan bidarizînin diçin dadgeha.

Li cografyaya ku em lê dijîn de, şer didome. Tîkiliya helwesta te ya "şernexwazî û neçûna leşkeriyê" û şerê ku didome çi ye?

■ Ji bo ku şer bê domandin; ji bilî tanq, top û bîr giştî amûrên şer, pêwîstî bi kesên ku şer bikin jî heye. Li hêla din xala herî girîng, bîr giştî psîkolojîya wan

"Em dadgehan meşrû nabînin, nexwasim 'dadgehên' leşkerî! Ji ber ku dadgehên leşkerî îro ji DGM'yan bêhtir saziyên taybet in ku bi bîrdoza kemalist ve girêdayî ne"



Redkarê Wîcdanî Osman Murat Ülke, hê jî li Dadgeha Leşkerî ya Işkânîbîrê girtî ye

kesan û pejiwandina

şer bi xwe ye. Helwesta "Redkarên Wîcdanî" jî vî alî ve bîngeha şer qels dike.

Jixwe îro li Tirkîyeyê bêhtirî sê sed hezar firarên leşkeriyê hene. Her çiqas hejmara "Redkarên Wîcdanî" îro kêm be jî, hebûna wan dike ku ev hejmar zêde bibe û gumanan bixe mêjiyê xortan da ku bizanibin riya neçûna leşkeriyê jî li ber wan heye.

Bêguman hejmara heyî nikare artêşê ji aliyê personelê ve bixê tengasiyê, lê hewldaneke bi vî rengî jî ji bo me girîng e. Dema me ev helwest bi raya giştî da pejiwandin, wê pêşî li ber propagandayên şovenîst û kevneperestan jî bi awayekî baş bê girtin. Ev yek jî dibe ku ji bo qedandina şer bibe navgîn ango bibe destpêk.

Têkoşîna ku tu didî di jiyana te de cihekî girîng digire. Osman Murat

Ülke, li ser xwe çi wekî bar dibîne. Ango bi kurtasî tu xwe çawa his di-kî?

■ Bi salan e ku ez li ser mîlîtarîzm û anti-mîlîtarîzm xebatê dikim, di navê dozê de me. Lewre jî ez jiyana xwe li gorî van pîvanan saz dikim. Ev yek jî bo min avantajek e. Bi vê rewşê re girêdayî, pêvajoya ketina girtîgehan ku ez tê de me, ji berê ve min xwe jê re amade kiribû. Lewre jî ji ber van egeran ez xwe di astengî û zorê de nabînim. Nemaze ez dikarim bibêjim ku ez li dûv pêdiviya biryarên xwe dimeşim. Li qîşlayê uniformayê û li girtîgehê jî "kincên yek-şewê" (tek-tip el-bise) li xwe nakim. Ji ber vê sedemê ez his dikim ku înisîyatîf li van deran di destê min de ye. Ev yek barê li ser milê min sivik dike û hêzê dide min.

HEVPEYVÎN: HAVVA OKAN
Ji tirkî werger: Salihê Kevirbîn